

WELAT



Rêveberê MED-TV Hikmet Tabak û Serokê Yekîtiya Rojnamevanên Kurd Günay Aslan bi daxuyaniyekê êrîşên li ser MED-TV'yê protesto kirin û diyar kirin ku ev êrîş plankirî ne. Günay Aslan da zanîn ku li Ewrûpayê bînpêkirina azadiya çapemeniyê bi destê hêzên mîltarîst mirovan ditirsîne.

Rûpel 5

Îcar jî studyoya MED-TV'yê dagir kirin

Serokê TADER'ê Şehmus Çelebi:

**"Em aştiyeke
birûmet dixwazin"**

Rûpel 8-9

Nûçeya Düzgün Deniz:

**Rewşa asayî ji Başûr
dûr dixuye**

Rûpel 3

Lêkolîna Dildar Şeko:

**Amûrên muzîkê
yên kurdewarî**

Rûpel 6

NAVEROK



Aynur Bozkurt: *Nehîştin ku Firat bi xemgînî biherike*

7



"Divê hunermend riya şoreşê bişopîne"

10



Heybet Bavê Helepçe: *Kaxizên alastî*

12

Ji Xwendevanan

EM di demeke pir tevlihev re derbas dibin. Di vê pêvajoyê de gelê me, dost û dijminên xwe hê bastir nas dike. Dostên gelê kurd li ku bin jî dengê xwe bilind dikin û dostaniya xwe diyar dikin. Dostên dijminê me yên xweşiroş bi tewr û tevgerên xwe nasnameya xwe ya rastîn didin dest.

Di dema şerê Cezayîrê de çawa ku nivîskarê fransîz Sartre, li dijî dewleta xwe ya mêtînger li nik gelê Cezayîrê cih girt û şer kir, îro li Tirkiyeyê jî wekî Mamoste Ismail Beşikçi û gelek rewşenbîrên hêja di nav tevgerê bi rûmet de ne. Li hemberî şerê kirêt derdikevin û mafdarbûna gelê kurd diparêzin. Di vê têkoşîna xwe de Beşikçi rûmeta zanistiyê wekî gelek 'rewşenbîran' nedaye bin piyan. Rastî, bi berdeleke pir mezin be jî parastîye.

Li aliyê din gelek xwelîliserên me hene ku qaşo kurd in û ji xwe re dibêjin em 'ronakbîr in û em rewşenbîr in' lê ku mirov li rewşa wan, jiyana wan û xebata wan dinihêre dilê mirov li hev dikeve. Divê rewşenbîr berpirsiya xwe ya dîrokî îro bîne cih. Dost jî, dijmin jî di roja teng de tîr naskirin. Roja ronakbîrtiyê jî, ya rewşenbîrtiyê jî û roja mirovahiyê jî îro ye. Sibe wê bibe dereng.

M. BEDRAN BÊNAV



Bi navê xwerûbûna zimên, em ji zimên dûr dikevin

MEHMET GEMSİZ

Di vê nivîsa xwe de ez dixwazim li ser zimane kurdî yê nivîskî rawestim. Hem jî, ji du aliyên ve.

I. Li ser zimane nivîsê

II. Bikarmanîna hin peyvên kurdî

Pêşiyê em li ser xala yekemîn bisekinin. Hema yekser em vê bibêjin ku peyv bi kurdî ne, lê ramîn û fikirîn ne bi kurdî ne. Bi gotineke din, kirasê kurdî li bejn û bala nivîsê hatiye kirin, lê belê ruh û canê wê ne welê ye...

Ji ber ku em bi piranî pêşî ne bi zimane xwe, lê bi zimaneke din dihizirin û pişt re jî em lê dixebitin ku wan ramanên xwe bi kurdî derbibin. Bi vî awayî, em yekcar biwêj, qalib û şayesên (teswîrên) zimane xwe di ser guhê xwe re diavêjin.

Em kûr û tîr nafikirin ku, her zimaneke xwediyê riya vegotinekê ye, xwediyê hin taybetiyan e.

Ji ber ku ez bawer dikim sedemên vê yekê tîr zanîn, lewma jî ez dixwazim li

ser encamê rawestim. Em nikarin baş hîna bi zimane xwe biramin û wan bi riya nivîsê derxin der.

Ev rexne ye, lê ne ji tevahiya nivîskarên kurdî re ye. Ez jî tê de, piraniya me di vê rewşa nepak de ne. Ji rûyê wê yekê, ji nivîsên me baş nayê fêmkirin. Ne em dikarin zimaneke sivik û fêstîh, û ne jî em dikarin zimaneke rewan bi kar binin.

Ji vê nexweşîne jî em dikarin zû bifilitin, dermanê wê zargotina kurdî ye, çanda me ya devkî ye. Gerek dike ku em li kana xwe bizivirin.

Çendî ku mijar û dabûşa xala duduyan bi ya berê re eleqedar be jî, ew jî gelş û gelemşeyê me ya din e. Ev armançê me ya jêner û tenebihur e. Bi navê bikarmanîneke zimaneke sade û xwerû, em bûne neyarên hin peyvên xwe. Me ew jî tirkî re hiştine; wekî ku ew ne bi kurdî bin. Lê em bêpaxav peyvên biyan mîna îngilîzî, fransîzî û hwd. bi kar tînin. Hemin go-

tin hatiye ser wan peyvên me yê terkîrî, em ji wan çend nimûneyan bidin:

qewxe, şehr, dîlek, xeste, sparîş, gerçî, çunkî, endîşe, qûşak, xizm, pergel, borc, perwa, çûl, hemşîre, numayîş, numa, çarşî, tane....

Îcar em radibin van peyvên xwe dihêlin û bi dû yê din dikevin, em naxwazin bi wan kar bikin. Ew jî gelşê me ya derûnî ye. Xwedêgiravî em zar û zimaneke xwerû bi kar tînin û em naxwazin peyvên biyan bixin nav zimane xwe.

Bi vê şeweyê, em jî şaşiya tirkî a derbarê zimane de tekar dikin. Riya ku ew pê de çûne, me jî daye ser wê.

Baş e ku em zimane xwe ji peyvên biyan paqij bikin, lê em vê bi bêhna fireh û bi zanebûn bikin. Em zimane xwe ji bin bandora zimane din derxin, wî zengîn bikin û bi pêş ve bibin.

Digelê wê, em ji bîr nekin ku tu tiştêkî xwerû jî ne mimkûn e di vê serdema me de pêk bê. Her wiha divê me hay ji danûstandina di navbera zimane de hebe.

Em bi zimane xwe bifikirin, pê binivîsin û em terka peyvên xwe nekin. Her wiha em zimane xwe jî neêşînin, neguvêşin û tehdêyê lê nekin.

Ronesans û taybetmendî

KERÎM BAQUSTANÎ

Ronesans di wateya xwe ya giştî de, rapêrîneke bingehîn e ku yekalî yan ji pîraliyên qonaxekê serûbin dike. Ji bo ku bi awayê rêdar û zagonên nûjentirîn hêz û mercên xwe bikişîne meydana heyînê. Ji aliyê din ve element û alavên wê dijev û ne wekhevîyên xwe de girêdayî ne. Ev jêv bêguman bi pêwistiyên cih û mêjuwan xwe girêdahî ne.

Mînakên dîroka kevn û nûjen peywendî û cudahiyan di navbera ronesans û şoreşên sor de dixe çarçoweya bersivên cur bi cur. Bi rengê ku van her du kirên serûbin kirinan digihîne hev an jî hev diqetîne; bi awarteyên teybetmendî li gorî girîngiya sedemên merêja sedeman.

Ev pîvanên levok her dem xwe pêk tînin. Bi taybetî ji destpêka şoreşa mirovîtiyê ya yekemîn ve, çar sal berî zayînê ta kêlîka şoreşîya M. Lothar 1557'yan piştî zayînê ku Ewropa ronesans kir û dehf da, hem ber bi sedsala hişmendiyê û hem jî ber bi şoreşên neteweyî û teknolojîk. Encamên ronesansê neteweyî yê ku di nivîyê duyemîn de ji sedsala 19'an derbas bû Rohhilata Navîn, bandor li hemû gelên wê heremê kir û durf û sîmya îroyin bi cih û war kir.

Kurdistan wekî navçeyê germ meydana pir bûyerên gewre û mezin bû. Rapêrînen neteweyî tê de wekî hê-

Destpêka ronesansa neteweyî ya kurdî di pêvajoka xwe ya giştî de ku dikare posîdeyên çalakgir berde movik û xelekên bingehîn, li bakurê Kurdistanê jî dayik bû. Ew di her du deh salên dawî de wekî encameke xwezayî hate der, ji marêja pir sedemên derveyî 'rojhilatî û navneteweyî' û hundirîn yê subjektîf.

sîrên hevgerîdanên eşîrî û hişmendîya olî man, her wiha jî serûyî û tenegehîştina polîtîkî û planzaniyê, bû yek ji sedemên ne gelêribûna wan hewldan û serhildanan. Ji bilî ku pêrewiya aborî piştqelsiya wan têkoşînan dikir yek ji encamên tîkîkî. Destpêka ronesansa neteweyî ya kurdî di pêvajoka xwe ya giştî de ku dikare posîdeyên çalakgir berde movik û xelekên bingehîn, li bakurê Kurdistanê jî dayik bû. Ew di her du deh salên dawî de wekî encameke xwezayî hate der ji marêja pir sedemên derveyî 'rojhilatî û navneteweyî' û hundirîn yê subjektîf.

Helbet bersiv diyar e ku çima tîrêjên wê ronesansê bi taybetî ji parçeyê Bakur hatin der, çî ji layê sedemên girêdayî polîtîka û mantalîteya (hişmendî) kemalîzmê ve û çî ji aliyê taybetiya komeleşha Bakur û refleksiyonên guherînan tîj ên li ser, di Tirkiyê, Rohhilata Navîn û cihanê de. Her wisa jî bilî ku ev kir wekî prensîbekî bingehîn, hemû şax û baxên xwe hîn berne dane firehî û kûrahiya civaka Kurdistanê (ji ber sedemên qonaxkirinên pêwîst), lê wan dikaribû civaka wisa ramedandî li ser

çog û kabokan rawestîne. Di pêvajoka wê mijarê de du taybetmendiyên balkêş tîne zimane:

Di mînaka Bakur de wateya giştî ya ronesansê dibe metod û pirat ji bo gîhana navsera wateya taybetmendî. Ango dibe çare ji bo bidestxistina welatêkî neteweyî û sazîkirina wî, dikeve rengê guherînan serekî di hiş û mêjiyê mirov û civakê de. Ew guherînan jî di bin siya manşetê pan de dibe 'her tişt bo Kurdistanê'.

Ez bi peyvek dîtîr dikarim bêjim ku ew tabloya felsefî dibe alavê yekemîn ji bo pêkanîna rapêrînan û gewdekî polîtîkî. Ev yek bi xwe me vedigerîne mînaka ronesansa Ewropayê ya ku min a-nî zaman di pêşî de. Lê jêv û newekhevîya her du bûyeran dikevin çarçova xala duyemîn ya tî.

Jeva di navbera kêlîka şoreşa sor a 15'ê gelawêjê û kêlîka şoreşa M. Lothar ya spî de, li pîrsgrêka hiş û ramana du navçeyên corafî de yê ne wekî hev vedigere. Li gorî wê jêvê pêwendiyên dînamî û diyalektîkî di sêguçê ronesansê de 'mîrov/ şoreş/ raman' xwe diyar dikin bi awayekî hemdemî...



LI SER derbeya 12'yê rezberê roja 15'ê rezberê li 9 navçeyên HA-DEP'ê panel çêbûn. Di van panelan de li ser sedem û encamên derbeyê şîrove û nixandînen cur bi cur hatin kirin.

Li Bahçelievlerê, Serokê Komîsyona Jinên HADEP'a Stenbolê Emine Mısırlî rewşa jinan sekîf. Her wiha ji Komîsyona Ciwanan Berivan Sincar li ser rewşa ciwanan û Osman Engîn li ser rewşa karkeran sekîf. Osman Engîn wekî karkerekî welatpêz diyar kir ku derbeya leşkerî nişana rizîn, xitimîna sistemê ne. Li HADEP'a Kadiköyê Serokê Enstîtuya Kurdî Şefîk Beyaz beşdarî panelê bû. Ji Azadiya Welat Düzgün Deniz jî li Kartalê beşdarî panelê bû.



HD'ya Amedê roja 16 rezberê daxuyanîyeke çapemeniyê belav kir. Di daxuyanîyê de tê gotin ku di nava mehekê de termê (cerdek) neh kesî li derdora bajarê Amedê û navçeyên wê hatiye dîtin. Daxuyanî diyar dike ku di nav van neh kesan de heta nika navê sê kesan diyar bûye. Ji van kesan Fevzi Orak bi destê çar polîsê n sîvîl hatiye girtin û ji wê pê ve tu xeber jê nehatiye standin. Nasir Alan jî dîsa ji aliyê çar polîsan ve hatiye girtin. Li gorî daxuyanîyê Nuri Yiğit jî ji hêla çar polîsan ve li mala hevlekî xwe hatiye girtin. Di daxuyanîyê de tê xwestin ku berpirsên wan kuştinan bê dîtin û rê li ber kirinên bi vî rengî bê girtin.

NÛÇE

Rewşa asayî ji Başûr dûr dixuye

Roja 18'ê rezberê Mesûd Barzanî hate Enqereyê. Wezîra Karê Derve Tansu Çillerê bi Barzanî re hevdîtin pêk anî. Di vê hevdîtinê de wê daxwazên xwe dubare kirin: "Xwe nêzîkî PKK'ê nekin, bi tirkmenan re hevkarîyê bikin û doza federasyonê ji bîr bikin."

Lê rayedarên PDK'ê gotin: "Em bi xwestina Tirkiyeyê bi PKK'ê re şer nakin. Ev problema Tirkiyeyê ye, divê ew bi xwe çareser bike."

Gava ku Başûr kete destê Barzanî, Talabanî û leşkerên xwe vekişin û çûn çiyayên li ser sînorên Îranê. Ji ber vê yekê Cîgirê Serokê PDK'ê Samî Ewdirehman di bernameya M. Ali Birand a bi navê '32. Gün' de diyar kir ku: "Ev têkçûna Talabanî ne ya yekemîn e. Belê ev a pêncemîn e. Divê êdî dev ji wan îdiayên vala berde û li cihê xwe rûne". Lê di vê bernameyê de Talabanî jî wisa axivî: "Têkçûna min ne bi destê Barzanî çêbû, lewre jî serkeftin a artêşa Iraqê ye. Îcar em dîsa nerevîne, a ha em li vir in. Barzanî nika bajar standine, lê belê gund û hemû çiya yên me ne."

Ji aliyê din ve Barzanî li ser daxwaza Tirkiyeyê rawestiya û diyar kir ku PDK tenê li gorî xwestina Tirkiyeyê bi PKK'ê re şer nake. Wî got: "Ev problema Tirkiyeyê ye. Divê bi xwe çareser bike."

Roja 18'ê rezberê Mesûd Barzanî hate Enqereyê. Wezîra Karê Derve Tansu Çillerê bi Barzanî re hev-

dîtin pêk anî. Di vê hevdîtinê de Tansu Çillerê daxwazên xwe dubare kirin: "Xwe nêzîkî PKK'ê nekin, bi tirkmenan re hevkarîyê bikin û doza federasyonê ji bîr bikin." Berî hatina Barzanî, Berdevkê Qesra Spî William Perry tevî cîgirê xwe hatibû Enqereyê, ew bi xwe piştî hinek hevdîtinan çû, lê cîgirê xwe li Enqereyê hişt ji bo ku bi Barzanî re hevdîtinan çêbike. Barzanî piştî rayedarên tirk bi wî re hevdîtin pêk anîn.

Kurdên Amerîkayê

Kurd û tirkmenên ku di plana operasyona CIA'ê ya ji bo daxistina Saddam de cih girtibûn, bi destûra Tirkiyeyê hatin Bakur û paşê jî çûn Amerîkayê. Piştî ku operasyona CIA'ê vala çû, rewşa personelên wê jî ket talûkeyeke mezin. Li gorî agahiyên rayedarên Amerîkayê, tevî malbatên xwe hejmara wan digihîje du hezar û heşt sed kesî. Ew kes bi balafiran pêşî dê biçin Girava Guamê. Li wir bikevin karantînayê. Ew ji aliyê tenduristî ve gere bîn kontrolkirin. Dûre jî, wê bi balafiran biçin Amerîkayê.

Li ser vê operasyona CIA'yê îdiayên nû hêdî hêdî derdikevin holê. Hefteya borî de Rojnameya Amrîkayê (DYA) ya bi navê deng Washington Post di nûçeya xwe de xuya kir ku ev operasyon bi haya Tirkiyeyê hatiye amadekirin. Di nûçeyê de ji xeynî vê tê diyarkirin ku, CIA'yê di sala 1991'ê de dest bi amadekariya derbeya li dijî Saddam kiriye. Ji bo pêdiviyên vê operasyonê li bajarê Selahadinê qerargehek damezirandiyê û zîlamên xwe di wir de bi cih kirine. Lê tiştê herî balkêş jî her çiqas komara tirk înkâr bike jî, heta bigihe çekên vê operasyonê jî bi destûra rayedarên tirk di ser Tirkiyeyê re çûne Başûr.



Başûr, Îran û Tirkiye

Gava ku KT'ê xwe ji bo dagirkirina Başûr amade kir vî demê li Rojhilata jiyana siyasetê ji berê germtir bû. Germahiya vî yekê tîkiliya ku Serokwezîr Erbakan di navbera KT û Îranê de çêkiribû, xera kir. Di civîna ECO'yê de Wezîrê Karê Derve ya Tirkiyeyê Tansu Çillerê ev notaya KT'yê da wezîrê Îranê. KT'ê di notayê de bi giranî li ser êrişên gerîla yên li hemberî qereqolên ku nêzî sînorê Îranê ne, rawestiya. Li gorî berdevkên KT'ê gerîla ji erdên Îranê tên, êriş didin ser qereqolan û dûre jî direvin diçin Îranê. Lê Îranê ev îdia nepejirand.

Di vê gelemşeya Başûr de surprîzeke din çêbû. Serokê DYA'yê Bill Clinton daxuyand ku Amerika (DYA) nika li dijî Saddam êdî şer namesîne, heta ku Saddam li dijî balafiran tiştêkî neke. Der heqê vî yekê de berdevkê DYA'yê William Perry got: "Me ji bo vê jî Saddam re planeke dorfireh şand. Di wir de me bal kişand ku gere Iraq li dijî biryarên saziyên navneteweyî serî raneke".

Di nav van gelemşeyên Rojhilata Navîn de ji leşkerên artêşa tirk ên ku di destê PKK'ê de bûn, İsmail Başaran (Çanakkale) û Mehmet Sıkılğan (Kırşehir) hatin berdan. Ev leşker piştî ku ketin nav êrdima Tirkiyeyê hatin binçavkirin. Tê gotin ku pênc leşkerên din jî, piştî wan hatine berdan.

DÜZGÜN DENİZ



Der heqê rastnuştêna kirdkî de kombiyayîşê Stockholmî (2)

M. MALMÎSANIJ

Ganî ma naye zî vajî ke him zemî-rê şexsî, him zî antişê (conjugaison) nê fiilî ca ra ca ferq kenê. Ma vajî şîweya Dêrsimî de wina yê:

Ez ûne/ ez o/ ez û/ ez a
Ti ya, o wo, a wa,
ma yîmê, sima yê/ şîma yê, ê/î yê
Ez Kurd ûne, ti Kurd a, o Kurd o
A Kurd a,
ma Kurd îme, sima/şîma Kurd ê.
Ê/yê Kurd ê,
ez gird ûne, ti pîl a, o defter o, a qem a.
Ma zaf îme, sima/şîma senik ê, ê zayne yê.

Menfiyê (negation) nê fiilî
Ez niyûne, ez nêbiyûne, ez nêbîviyûne

Ti niya, ti nêbiya, ti nêbîviyane
Ti niya, ti nêbiya, ti nêbîviya
O niya, o nêbî, o nêbîvî
A niya, a nêbiyê, a nêbîvî
Ma nîme, ma nêbîme, ma nêbîvîme
Sima/şîma niyê, sima/ şîma nêbiyê,
sima/ şîma nêbîvî
Ê/ yê niyê, ê/ yê nêbiyê, ê/ yê nêbîviyê

Her çiqas ke no fiilo corî fiilê "biyene" / "biyayene" maneno zî no "biyene" / "biyayene" niyo, yewna fiil o. Muqabilê fiilê "biyene" / "biyayene" frenskî de "devenir", îngilizkî de "to become" o û wina ancîyêno:

Biyene/ biyayene/ biyayîş
Ez bena/ ez beno, ti benî
Ti bena, o/yû beno, a/ya bena,
ma benê, şîma benê, ê/ yê benê

Şîweya Dêrsimî de
Ez benû/ ez beno/ ez bena/ ez ben
Ti bena, o beno, a bena,
ma beme, sima/ şîma benê, ê/yê benê

Fiilo piyabeste
Fiilo piyabeste (verbe composé, bileşik fiil) çend tewirî yo. Cêr ra ma meylê kombiyayîşî gore nuştêna nê tewiran nusênê:

1-Prefikso yewheceyin+ fiil
Gege yew prefiks (önnek) û yew fiil piya yewna fiilê newî virazenê. Yanî prefiks+fiil= fiilo piyabeste.

Çend prefiksê yewheceyinî: a-, ci-, de-, ra-, ro-, we-, pa-, pê-, po-, tê-, to-.
Fiilê ke hîna zaf nê prefiksan dim a yenê û fiilêdo newe virazenê nê fiilî yê:
Ameyîne/ ameyîş, dayene/ dayîş, guretene/ girewtîş, kerdene/ kerdiş, kewtene/ kewtîş, mendene/ mendîş, fistene/ vîstîş.

Prefikso yewheceyin û fiil, mesder (infinitif) de piya nusiyênê.

Nimûne (hetê Pîranî de): Akerdiş, dekerdiş, dekewtîş, padayîş, pakerdîş,

pêşanayîş, pokerdiş, radayîş, rodayîş, ronayîş, têşanayîş, tokerdiş, wekerdiş

Nê fiilî cayan gore di tewirî ancîyênê. Tanî cayan de fiil ke ancîno, prefiks fiilî ra ver yeno.

Nimûne: Akerd, rakerd, dekerd, pakerd, wekerd, rona

Tanî cayan de zî fiil ke ancîno, prefiks fiilî ra pey yeno:

Nimûne: kerd a, kerd ra, kerd de, kerd pa, kerd we, na ro.

Zeke nimûneyanê corînan de zî aseno, eke antena fiilî de prefiks fiilî dim a bêro, fiil û prefiks -antene de- ciya nusiyênê. Labelê eke antenê de prefiks fiilî ra per bêro, prefiks û fiil piya nusiyênê.

2- Prefikso zafheceyin+fiil

Eke prefiks (önnek) zafheceyin, yanî yew hece ra zafêr bo, prefikso zafheceyin û fiil ciya nusiyênê. Yanî prefikso zaf heceyin ze yew çeku, fiil zî ze yew çeku nusiyênê. Bêguman nê her di kelîmey fiilêdo newî virazenê.

Çend prefiksê zafheceyinî: Bider-/ bere-/ bede-, cira-, tira-/dira-, pede-, pêra-, pêro-, pira-, piro-/ pero-, tede-/tedî-, têra-, têro-, tiro-.

Nimûne (hetê Dêrsimî de): pêra biyayene, pira guretene, piro dayene, piro ginayene, piro kerdene, têra çarnayene, têra kerdene, têro cinitene.

Nimûne (hetê Pîranî de): pêro dayîş, bere şanayîş/ bede şanayîş, tira kerdiş/ dira kerdiş, pede kerdiş, pêra nayîş, pira kerdiş, piro şanayîş, tede mendîş, tiro kerdiş.

Nê fiilî cayan gore di tewirî ancîyênê. Tanî cayan de fiil ke ancîno, prefiks fiilî ra ver yeno.

Nimûne: pêro da, dira kerd, têra kerd, tede mend

Tanî cayan de zî fiil ke ancîno, prefiks fiilî ra pey yeno:

Nimûne: da pêro, gina piro, na pêra
Her di tewiran de zî prefiks û fiil ciya nusiyênê.

3) Name/sifet + fiil

Gege name û yew fiil yan zî sifet û yew fiil fiilêdo newî (fiilê piyabestî) virazenê. Nê tewir fiilan de name û fiil zî, sifet û fiil zî ciya nusiyênê.

Name û fiilî ra

Aw dayene/ aw dayîş, bare biyayene, bawer kerdene, ca ardene, dawet kerdenene, pars kerdene, pers kerdene

Sifet û fiilî ra

Berz kerdene/ berz kerdiş, derg biyayene, gird (girs) kerdene, pak biyayene, siya kerdene, sûr kerdene, weş kerdene

4) Fiil + fiil

Amayîne kerdene, amayîne vatene, dayene guretene, dayene kiştene, dayene vatene, dayene wendene, dayene zayayene

Fiilan de menfiyey (negation)

Kirdkî/ kirmancî de fiilî ebe "nê-", "ni-" û "me-" menfî benê. Fiil û "nê-",

"ni-", "me-" piya nusiyênê. Nimûne:

nê-: Nêweno, nêzano, nêva, nêkerdo, nêveşenê, nêwanena, nêşimeno, nêantbî, nêşutbî,

nêdekerdbî/ denêkerdbî, nêrakerd/ ranêkerd, nêrakerdo/ ranêkerdo
nêda pêro/pêro nêda, pira nêguret, piro nêgina

weş nêkerd, sûr nêkerd, bawer nêkerd, nêard ca, nêramit ser, nêda wendiş/ wendiş nêda, veng ci nêda/ veynda yê nêda

ni-: Nişno/ nişkeno/ nêşkeno, nizo- no

me-: Mebere, meke, mevaje, mewane, merake/ rameke, meagêre/ megêr a, meraşane/ rameşane, wa nêraşano, wa nêdeko/ wa denêko, wa nêagêro/ wa nêgêro a, meake, cira mevaje/ tira mevaje, sûr meke, bawer meke, meşo war, veng ci mede/ veynda yê mede, mede wendene, ramekewe/ merakwi, wa nêrakerwo/ wa ranêkwo, mewene, wa nêwano

III - Edatî (prepozisyon û postpozisyonî)

Kirdkî/ kirmancî de edatî hîrê tewirî yê û çekuyanê bînan ra ciya nusiyênê. Cêr ra şîma çend nimûneyan wanênê:

1- Prepozisyonî

be.../ ve...

Ez şêna be Diyarbekir.

Xatir be to./ Xatir ve to bo.

Êno ve dewe.

Mi îman ve pîrê xo ardo.

bi... /ebi... /ebe... /eve...

Bi peranê xo erînawo.

Ebi des camêrdan rayîr kewt.

Eve dest werd.

bê...

Bê to ma nêşinê.

Bê wendene menusênê.

pey ...

Pey peran gurey xo viraş.

ver bi ...

Mêrdêk ver bi hêgay şî.

Not: eke "bê-" çekuyê ra ver bêro û sifetê virazo, "bê-" û çekuyo ke dim a yeno piya nusiyênê. Na "bê-" ya ke sifetan virazena rolê prefiksî vîna. Nimûne:

bêaqil, bêbext, bêçare, bêhêş, bêhêvî, bêkar, bêkes, bênamûs, bêsol, bêşeref, bêveng.

2- Postpozisyonî

...de/ ...di/ ...der/ ...dir

Lajek tenge de wo./ Lajek tenge der o./ Lajek tengi di wo./ Lajek tengi dir o.
Çanteyê mi di qelemî çinî yê.

Dewe de çi esto çi çin o?/ Dewi di çi esto çi çinê yo?

...ra/ ...a/ ...ya

Mi ra pey ame.

To ra girewt.

Ma ra va.

Ez semedê şîma ra ameya.

Lajekî lewi keyneki ra day./ Lajekî

lew keynek a day.

Ez semedê şîma ra ameya./ Ez semedê şîma ya ameya.

... ro

Şîwanî bizê xwi ko ro berdê, deşte ro nêberdê.

... ya

Mêrdêk di xizmekaran zî kênay xwi ya şaweno.

3- Prepozisyonî û postpozisyonî piya

a ... ra

Lajek çinayanê xo dano a xo ra.
beynatey ... di/beyntarê... di

Beynatey min û to di çî çinê bi./ Beyntarê min û to di çiyekî çinê bi.

bi ... a/bi ... ya

Mêrdêk bi yew cenî ya amewo.

bi ... bê/ebi ... bê

Keyneki bi fek bê xwi vato./ Keyneki ebi fek bê xwi vato.

ede ... de/di ... de

"Xidê Momid, ede raya trêna Erzîngan de tasaron bî."

"Tayê cênî, cûwamêrd, domon, eskeronî şuarû day arê, ede Korta Hêmez de bêrd."

"Hen eve o qêyde ede dustê bononê Çê Ferê Bilej de bî vînd şî."

"Çiqas bon, ede o Estemol de, cawonê bînu de, hemêgê ma ra amê virastene nîno hesavkerdene."

"Naye ser o ez niştûne ro taxsî, tekî û şîne Hêyder Paşa (Haydar Paşa), mi ede trêne de pêguret." (Mûnzûr Çem, Hotay Serra Usifê Qurzkizî, r. 83, 96, 104, 205, 209)

pey ... ra

Mêrdêk pey berî ra vejîya.

ve ... ra/bi ... ra

Ez ve to ra piya some.

IV-Hûmarî

Kirdkî/ kirmancî de vatîşê tanî hûmaran de ca ra ca ferq esto. No kombiyayîş de ma hîna zaf vîst hûmaranê verînan ser o vindertê.

Hûmaranê "yew" ra heta "des" (1-10) ser o meylê kombiyayîşî: Yew, di, hîrê, çar, panc, şeş, hewt, heşt, new, des.

Formê bîni: yo/ jew/ jû/ zû, didi, hîrê, çêher/ çîhar/ çor, panj/ ponc/ ponz, şeş, hawt/ hot, heşt, no, des.

Hûmaranê "yewendes" / "des û jû" ra heta vîstî (1-20) ser o di meylî biy.

Meylê nêmeyê amadebiyayoxan (kesanê haziran) û nêmeyê bîni ciya bi.

Meylo yewin: Yewendes, diwêş/duyes, hîrêş, çarêş, pancêş, şiyêş, hewtêş, heştêş, newêş, vîst.

Meylê diyinî gore, merdim şîno ebi nê her di formanê cêrînan binuso:

a) Yewendes, diwêş/duyes, hîrêş, çarêş, pancêş, şiyêş, hewtêş, heştêş, newêş, vîst.

b) Des û jû/ des û jew, des û didi, des û hîrê, des û çar, des û panc, des û şeş, des û hewt, des û heşt, des û new, vîst.

Îcar jî studyoya MED-TV'yê dagir kirin

Roja 18'ê rezberê 200 cendirmeyên belçikî êrîş birin ser zêdetirî 20 saziyên kurdan û 60 kes girtin bin. Di nav wan saziyan de PKDW, MED-TV jî hebûn. Piştî çavê deriyê studyoya MED-TV mor kirin, ji ber vê yekê weşana MED-TV qut bû.

Kurd diçin ku derê ji belaya polis û cendirmeyan xelas nabin. Polis û cendirmeyên ku gundên wan dişewitînin, malên wan wêran dikin û wan mecbûrî koçberiyê dikin, metropolên tirk û Ewropayê jî êrîşan dibin ser saziyên wan û nahêlin ku ew li televîzyona xwe temaşê bikin. Hêzên dagirker û şirikên wan bi pest û pêkutiyên xwe, bindestbûna kurdan tînin bîra wan. Hefteya çûyî du bûyer qewimîn, yek li Edeneyê ya din Bruksela Belçikayê.

Roja 14'ê mehê 30 polisên sivil êrîş birin ser mala nûnerê rojnameya me. Ji 9'ê şevê heta 11.30'ê şevê di malê de qereqol ava kirin. Li bavê nûnerê me yê 45 salî xistin, heqaret li dayika wî kirin... Piştî antênê peykê tevî cîhaz û ji sedî zêdetir kasetên bi bandrol ên kurdî, 15 heb dîsketên kompîturê û 4 jî Azadiya Welat mîna hêmanên sûc bi xwe re birin. Ew bi kuştinê tehdît kirin.

Roja 18'ê rezberê 200 cendirmeyên belçikî êrîş birin ser zêdetirî 20 saziyên kurdan û 60 kes girtin binçav. Di nav wan saziyan de PKDW, MED-TV jî hebûn. Piştî deriyê studyoya MED-TV mor kirin, ji ber vê

yekê weşana MED-TV qut bû.

Piştî ku endamên PKDW'ê û xebatkarên MED-TV'yê hatin berdan Serokê PKDW'ê Yaşar Kaya daxuyaniyek da çapemeniyê.

Yaşar Kaya wiha diyar kir: "Ev êrîş cendirmeyên Belçikayê berî sê mehan hatiyê plankirin, ev li dijî hiqûqa navneteweyî ye, li dijî azadiya çapemeniyê ye..." Disa Serokê PKDW'ê Kaya diyar kir ku, di bûyera Qibrîsê de berpîrs dewleta tirk e. Li aliyê din Yaşar Kaya der barê weşana MED-TV'yê de jî wiha got: "Wê di navbera du sê rojan de dest bi weşana asayî bike, weşanên ku tên kirin jî ji kasetan tên kirin."

Li aliyekî dewleta tirk ji bo ku weşana televîzyona kurdî bide rawestandî, serî li her çareyê dide, li aliyê din jî li Kurdistan û metropolên Tirkiyeyê êrîşan dibê ser malên kurdan û dest danîna ser antênên wan ên peykan ji bo ku li MED-TV'yê temaşê nekin, lêdan û îşkenceyê li mirovan dikin.

Wekî minak, li Edeneyê di salekê de bi sedan kes, ji bo ku li MED-TV'yê temaşê dikin malên wan hatin talankirin, antênên wan ên peykan hatin şikandin û an jî polîsan dest danîna ser antênan wan. Ji wan kesan nêzikî 30 kesî serî li saziyên mîna HA-



DEP, İHD, ÇHD û dozgerên Cumhuriyetê dane. Li ser navên wan Serokê HADEP'a Edeneyê û Endamê Meclîsa Partiyê Eyüp Karageçi tevî rayedarên partiyê serî li Waliyê Edeneyê da, lê tu encam ji vê hewldanê jî derneket. Kesên dotira rojê, diçin Emniyetê ji bo ku antênên xwe bistînin tene qewitandin, an jî lêdanê dixwin. Tê gotin ku polis van antênên peykan dibin, li taxên dewlemendan difiroşin.

Çend kesên ku hêzên dewletê dest danîye ser antênên wan ên peykê: Ji taxa Barbarosê: Mehmet Göktekin, Selime Demir, İzzet Toprak, ji taxa Ovayê: Necmettin Er, ji

taxa 19 Mayısê: İbrahim Özdemir, Osman Bozkurt, Halil Ceviz, ji taxa Mithatpaşayê: Melahat Güven, Sakine Kaya, Caziye Sağlam, Ali Ünlü, İbrahim Elban, Nuri Balçık, ji taxa Denizliyê: Ahmet Akbalık, ji taxa İsmetpaşayê: Heybet Altun, ji taxa Dağlıoğluyê: İzzettin Bozkurt, Mehmet Sümer, Etem Sümer, ji taxa Havuzlu Bahçeyê: Ahmet Sümer, Abdulgani Filiz, Şehmus Öztepe, ji taxa Kiremithaneyê: Mehmet Karayığit, Mahmut Al, ji taxa Yenibeyê: Abdulkerim Babat û ji taxa Gülbahçeyê: Emine Adıbelli, Burhan Altın, Murat Coşkun...

NAVENDA NÛÇEYAN

Dijminê aştiyê dijminê gelan û Xwedan e!

CELALETTİN YÖYLER



Ez di vê nivîsa xwe de dixwazim aştiya di navbera gelan de bi awayê ola (dînê) îslam bînim zimên û binirxînim. Ji ber ku kesên li Tirkiye û bakurê Kurdistanê dijî piraniya wan misilman in û hev û du dikujin. Hem jî bi navê hin nixên olî û neteweyî. Wekî çawa ku "Serokwezîra" berê û Cîgira Serokwezîr Tansu Çiller her tim dibêje: "Bang, al û welat wê her tim hebin." A ez di vê de dimînim şaş, lewre ev nix, her malê wê bi tenê ne. Xaka ku niha em li ser dijî ne malê nijadê tirk bi tenê ye jî. Tirk in, kurd in, laz in, ereb in, gurcî ne û hinekên din bi hev re ji bo vê xakê şer kirine û ew rizgar kirine. Tansû û Turkeş û Silo bi tenê ev der ji dagirkeriya biyanan rizgar nekirine. Van gelan bi hev re rizgar kirine.

Yek jî ev jinik, her tim li ser megafonan qala bangê dike, gelo ev jinik dixwaze kê

bixapîne? Êdî ew nikare tu kesî bixapîne. Lewre kesên ji gelên tirk û yên kurdên xwenas, êdî bi mêtîngeriya olê nayêne xapandin û dizanin ku ev gotina wê ne ji dil e û derew e. Lewre bang deng û banga Xwedayî ye, ji bo misilmanan û bawermendan ku ew ji rîya Xweda dernekevin û bi gotinên wî tevbigerin. Lê Xanim Çiller çi dike? Ew ji sedî sed li dijî banga Xweda tevdigere û di rojekê de deh bîst, pêncî, carinan jî, sed misilmanî bi hev dide kuştin. Gelo ewên ku hev dikujin kî ne? Xort û ciwanên her du gelan in. Hêvî û dil û kezebên dayikên tirk û kurdan in. Lê bang qîrîneke Xwedayî ye û dema mele bang dide, dibêje: "Xwîna birayên xwe yên misilman nerijînin û nedin rijandinê." Hem jî hêstirên çavên dayikan nedin barandin, kezebên wan nedin şewitandin. A ev e banga Xweda. Lê banga ku "jinik" dibêje ez tişteki jê fêhm nakim. Lê ez ji banga Xweda baş fêhm dikim. Xweda di sûretê hucûrat de di ayeta nehan û ya dehan de, wiha dibêje: Gelî bawermendan, heke du aliyên ji bawermend bi hev re şer kirin, hûn di navbera wan de xebata aştiyê û lihevanîne bikin. Lê heke yekî ji wan her du aliyên, bêdadî kir ji sînore dadiya Xweda derbas bû û li ser aliyê dinê

şer, stemkarî kir û aşî nexwest, divê hemû misilman êrîşî ser wî aliyê sitemkar bikin, heta ku ew sitemkar bizivire bal dadvaniya Xweda!"

Ez di vê nixandina xwe ya olî de, dixwazim ji bilî Cîgira Serok wezîr, ez ji Serokwezîr "Erbakan" re jî bangekê dikim, ji bo ku xebata aştiya di navbera gelên me yên misilman de bikin. Lewre Erbakan dibêje: "Ez di ramanên xwe de dixwazim ku rêzik û zagonên dadmendiyê bînim vî welatî, hem jî dadmendîya (edaleta) Xwedayî bînim. Eger ev bîr û baweriyên wî yên Xwedayî rast in, divê ew, alîkar be ji bo aştiya ku Xweda di Quranê de ji bo misilmanan gotiye. Ne hewce ye ku ez wateyên wan ayetên Quranê ji Erbakan re dubare bikim. Lewre ew; dema ku li sûretê hucûrat, li ayeta reqem neh û dehan binêre, ew baş dizane ku Xweda ji bo aştiya di navbera misilmanan de çî dibêje.

Banga min ji bo hemû kesên bawermend û misilman e, ku ew banga Xweda ya ji bona aştiya di navbera kesên misilman de seh bikin û lê bibin xwedî. Lê eger ew guhê xwe nedine banga Xweda û vî şerê qirêj nedine rawestandî, ewê li bal Xweda bêne etabkirinê.

Amûrên muzîkê yên kurdewarî

Wekî ku tê zanîn, yek ji kevntirîn milletên cîhanê, milletê kurd e. Ew li şûnwarekî herî berbiçav yê mējûyî, li Zagrosan û li Mezopotamya-yê binecih e. Li gorî daxuyakirina dîrokzanên cîhanê, şûnwarê kurdan wekî "Landika şaristaniya mirovatîyê" hatiye pejirandin.

Bêguman her mirovek, her komeleyek, her miletek li gorî merc û kawdanên erdnîgariya xwe reng dide û berhemên xwe yên cur bi cur pêk tîne. Ji ber vê yekê ye ku her miletek li dûv mercên erdnîgariya xwe, bi afirandina hinek berhemên xwe yên kevnasalan navdar û serbilind e.

Bê çawa milletê faris, bi helbest û stran û awazên xwe yên mest û bengîn navdar e, bê çawa milletê ereb bi hêçtir (deve) û dara xurmê û bi toreya xwe ya berfireh û têr rewrewk (serab) navdar e, bê çawa milletê tirk bi rêxistin û hunera xwe yê leşkerî navdar e, her wisa milletê kurd jî, bi rez û werzê xwe, bi garan û pezê xwe, bi zengîniya stran û awazên xwe, bi govend û dîlanên xwe yên gelêrî navdar e.

Bo nimûne; piraniya erdnîgariya ereban xîzistan e, panaviyeke têr hetava hişk û zuwa ku ne serî û ne dawî ye. Li vî welatî, serê her gavekê ji nişka ve babîzok radibe, ji toz û dûmanê çav çavan nabîne. Piştî derbasbûna babîzokê, li wê rasta Xwedê tê dîtî ku nîv çiyayekî rût û tazî bi hemû metirsiya xwe ve li pêşberî mirov wisa bêdeng rawestiyaye. Serê sibê gava mirov ji xew radibe..., ka ew nîvçiyayê rût û tazî ku do êvarî li vir rawestiyayî bû?! Her wekî erd qelişîye û tê re çûye xwar. Her wekî xewnek hatiye dîtî.

Ew zir-çiyayê rût û tazî ku do êvarî bi hemû metirsiya xwe ve li ber çavan rawestiya bû, babîzokek din hatiye û ew li ber xwe birîye. Tew şûna wî jî ne diyar e. Helbet, di kawdanên erdnîgariyeke wisa de wê torevaniya vî miletî ji layê sur-realîzmê ve zengîn û berfireh be.

Li hemberî vê rewşa welatê ereban (min nevet li ser rewşa tirk û farisan rawestim, kêma zêde tê zanîn), vêca gava ku mirov li welatê kurdan dinêre, deştên pir av, çiyayên têr hetav, newal û geliyên têr dar û ber, têr giya û giyanewer, têr berf û baran, tev rûbar û kanî. Gava ku bi berbanga sibê re, bi destpêkirina qeqeba kewan, wîwêwîta çûk û berkutokan, lalbûna şalûl û bilbil û kiroskan, digel surweya bayê zozanan gava ku di geliyan re sernîşîv di nav pelên renga reng ên daran re xwe nerma nerma diparzinîne û digel şirîniya silavan û bi alastîna rîyê lat û zinaran ber bi deşt û panaviyan rewane dibe û di gopîtka çiyayên li hember re tîkîlî



Neyjenê kurd Mam Dîwane Şakir ji bilî neyê dikare gelek amûrên pîfîkirî wekî şimşal, balaban, bilûr û zirne bijene.

Bêguman her mirovek, her komeleyek, her miletek li gorî merc û kawdanên erdnîgariya xwe reng dide û berhemên xwe yên cur bi cur pêk tîne. Ji ber vê yekê ye ku her miletek li dûv mercên erdnîgariya xwe, bi afirandina hinek berhemên xwe yên kevnasalan navdar û serbilind e.

aso dibe, senfoniyeye surîştî ya bêkemasî li ber çavan û di guhan de pêk tîne.

Vêca miletekî wisa, xwediyê erdnîgariyeke ku ji hemû layên hunerî ve zengîn, ma dibe ku bi dirêjîya hezar salan amûrekî mûsîqî neafirandibe?! Emê bersiva vê pirsê li hêviya lêkolînerê folklorê kurdî û nivîskarê pirtûka "Amêrekanî Mûsîqay Kurdî" (Amûrên muzîka kurdî) mamosta Ûrya Ehmed bihêlin.

Mamosta Ûrya Ehmed, piştî lêgerîneke berfireh a li ser keleşor û amûrên muzîka kurdî di nav gel de û piştî gelek jêderk û çavkaniyên ji kovar û rojnameyên erebî, kurdî û ewrûpî, di sala 1989'an de, pirtûka xwe ya bi navê "Amêrekanî Mûsîqay Kurdî" ku ji 224 rûpelan pêk hatiye, bi kurmanciya jêrîn (sorani) li Hewlêrê çap dîke. Mamosta Ûrya, di pêşeya pirtûka xwe de dibêje:

"Di baweriya min de kes nikare nikûliya (înkara) wê rastiyê bike ku mi-

letê me ji heyamên kevn de xwediyê gelek amûrên muzîka resen, (dahol û zurne) bûye û pê kar kiriye."

Her wisa di berdevama axaftina xwe de li ser zardevê nivîskarê ereb, Ebas El 'Ezzawî ku di pirtûka xwe ya bi navê 'El Mûsîqe el Iraqîye fi 'ehdel Moxol wel tirkmanî' (mûsîqeya Iraqî di dema Moxol û tirkmanan de) jêderka wî jî 'Ebi Talib el Mufeddel, 902 z.', (li Seraya Topkapı parastî ye) dibêje ku: "Tenbûr, yekemîn car ji layê qewmê Lût ve hatiye bikaranîn. Belê zurne û herçî amûrên pîfîkirî yên ku hene, ji layê Îsraîliyan ve hatine pêkanîn û şimşala qamîşî jî, her ji destpêkê de şivanên kurdan ji bo komkirina pez û dewarên xwe jenandine. Def jî (erbane) ji layê ereban ve hatiye çekirin."

Her di beşê duwemîn yê wê çavkaniyê de, Ebas 'Ezawî dibêje: "Yekemîn kesê ku amûrê Ûd (Kod) bi destê xwe girtiye, kurê Mutûşlih Lemek bûye. Belê Topalê kurê Lemek, ji bo tenbûrê

tepl û def jenandîye. Keça Lemek Zelal ji amûrên jêdarî pêk anîne."

Mamosta Ûrya, piştî daxuyakirina nerînên hinek zanyar û pisporên muzîkê, pêzanînen çavkaniyeke din wisa pêşkêş dîke: Profesore Elmanî W. Stauder, yekemîn pirtûka xwe bi navê 'Çeng û Kinareya Sumerî' di sala 1957'an de çap dîke û duwemîn pirtûka wî jî di sala 1961'ê de, bi navê 'Amûrên Çeng û Kinareya Rojhilata Dûr di dema Babilî û Aşûriyan de' derket.

Zankoya Frankfurtê ya ku Prof. W. Stauder jî lê pispor û mamostayê muzîkê ye, bi lêgerînen xwe yên hêja ên li ser ziman û mējûya muzîkê navdar e. Prof. W. Stauder dibêje: "Amûrên Ûd, Çeng, Kinare û gelek amûrên dîtir yên kevn ên rojhilat jî, yekemîn car ji layê çiyayîyan wekî Kaşî, Hisî, Xûrî û bi taybetî jî ji layê Xûriyan ve hatine dirustkirin û wan digel xwe anîne Iraqa kevn. Çûnke, di panzdemîn sedsaliya berî zayînê de van komeleyan (civak) desthilatdariya li ser navçeyên li navbera Gola Wanê û Bakurê Iraqê dikir..." Hêjayî gotinê ye ku gelek pispor û lêkolînerên wek (Aign, J.Rimmer, Hartman û hd.) digel wê nêrîna Prof. W. Stauder in.

Yek ji pisporên ereban Dr. Subhî Enwer Reşîd jî, bi tundî li dijî wê nêrîna W. Stauder radiweste û dibêje: "Amûrê Ûd û gelek ji amûrên dîtirî muzîka Rojhilat ku evên navbirî (mebesta wî Stauder û zanyarên dîtir in) reha wan digihînin çiyayên regez arî, em jî ji wan re dibêjin, ev amûr ji layê çiyayîyan ve negihîştîye şaristaniya Ekadî û Babiliyan ku ji nijada Samî ne. Belkû her di destpêkê de peydakar û dirustkerên piraniya amûrên muzîka Ekadî û Babilî bûne." dibêje.

Pirtûkek bi navê 'Mējûya gişt amûrên muzîka cîhanê' ku ji layê profesore almanî Kraitsch ve hatiye çapkirin, reha amûrê ribabê digihîne kurdan û dibêje:

"Jêderka amûrê Ribabê Bakurê rojavayê Îranê ye û ev amûr pêkanîna kurdan e."

Di axaftina xwe ya dûr û dirêj de ya li ser amûrên muzîka kurdî digel jêderk û çavkaniyan, Mamosta Ûrya, amûrên muzîkî wisa dabeş dîke.

Amûrên rezm û kutanê: Dehol, def, tepl, yek teplî (tas), du teplî, zil (senc).

Amûrên pîfîkirî: Amûrê baleban, zurne, şimşal, duzele, bilûr, tulim,

Amûrên Jêdarî: Tenbûr, semtûr, kemançe, ûd, tar, çeng,

Piştî daxuyakirina van nerînên zanyar û pisporên muzîkê yên ji hev cuda, em danasîna van amûran bihêlin hefteyeke din.



● 28.9.1992

Navenda Çanda Mezopotamyayê ava bû. NÇM ji aliyê hin rewşenbîrên kurd ve hate avakirin. Di damezirandina NÇM'ê de ev kes hebûn Filiz Uğuz, İbrahim Gürbüz, Mahmut Nayır, Cabar Gezici, Bahri Gezici, Ali Ekber Oğuz. Navenda Çanda Mezopotamyayê bi temamî ji bo ronikîrîna çand, huner û edebiyata kurdî xebat da dest pê kirin. Piştî avabûnê di her warê çand û hunerê de dest bi xebatê kir. Di salvegera wê ya 4'an de şaxên NÇM'ê li bajarên wekî, Hewlêr, Stenbol, Edene, İzmir û Mersînê vebûn, şaxa Amedê ji ber zîlm û zordariya hêzên dewletê nikare çalakiyên xwe bimeşîne. Ji komên muzîkê bigire heta komên şano, koroya zarokan, koroya ciwanan, govend, şaxa dîtarî

ku xebatên sînemayê dikin û Kovara Rewşen tê derxistin.

● 25.9.1994

Li Tirkiyeyê cezayê îdamê yê dawîn hate kirin. Piştî vê dîrokê êdî cezayê îdamê wê li Tirkiyeyê çênebûya. Ji avabûna komara tirk heta vê dîrokê 588 kes hatine îdamkirin. Her wiha piştî xebatên Rêxistina Komeleya Efüyê ya Navneleweyî wê ev dîrok bibûya dawiya cezayê îdamê, lê bi derxistina qanûna 'Têkoşîna bi terore' re îcar îdamên bê mehkeme rû dan, bi taybetî ji li ser şexsên siyasî.

● 24.9.1994: Li Bîngolê li taxa Cumhuriyetê pênc zarok bi navê Recep Tartar (8), Emrah Tartar (9), Kadriye Savaş (8), Faruk Savaş (11), İbrahim Savaş (9) ji aliyê hêzên dewletê ve hatin qetilkirin.

AWIR

Nehiştin ku Fırat bi xemgînî biherike


Melik Fırat careke din aştîya gelan parast û got, "Dikarin me bigirin, dikarin me bidin mehkemeyê jî, me bikin hepsê jî, dikarin me îdam jî bikin. Em ji giştikan re jî hazir in."

Pirtûka bi navê "Fırat Mahzun Akar" a Abdülmelik Fırat ji aliyê DGM'ê ya Stenbolê ve hate berhevkerin. Tê îdiakirin ku bi van nivîsan ên ku di pirtûkê de cih digirin; "Siyasetten Serpintiler", "Mafia", "İtidal", "Yazık Oluyor" û "Alamut", "Bi riya ferqûmêliya nîjadî û herêmî, li dijî hev fikirina gel" hatiye xwestin û her wiha bi nivîsên "Kewa Mîrê Garzan", "Sohbet", "Mazlum" û "Amed-Diyaribekir" jî "Pro-paganda, li dijî yekîtiya erd û neteweya Komara Tirkiyeyê" hatiye kirin.

Her wekî tê zanîn ev pirtûk berî bi demeke kurt ji aliyê Weşanxaneyê Avestayê ve hatibû çapkirin. Biyografiya Melik Fırat, nivîs û daxuyanîyên wî yê ku di weşanên cur bi cur de derketine, nivîsên li der heqê girtina wî de tevî hin wêneyan, di vê pirtûkê de cih digirin.

Ji ber vê berhevkerinê Abdülmelik Fırat ji me re daxuyand ku, "Di vî welatî de, ew mirovê ku çavê wî vekirî be, hişê wî li serî be, gêj nebe, wê bibîne ku ev sistem, sistema zorbeke û bêkîş (bêdîn) û bêqerar e. Jixwe sebebê hikmetî wicûda wê ew e. Em jî di peyvandin û nivîsandina xwe de wiha dibêjin: Alametên wê yê farîqe sisê ne: Zîlm û derew û talan e. Di vê sistemê de ev hikumran in."

Melik Fırat li hemberî îdiayên der barê nivîsan de jî, ev tişt anîn zimên: "Tiştên ku îdia dikin, lizûm nake ku di nivîsan de hebin. Di vê sistemê de qanûn û edalet û hiqûq tune. Çawa kêfa wî were, wisa hereket dike. Tu jê re



Berga pêşîn a pirtûka "Fırat Mahzun Akar"

destek gul bînî, dibêje te agir aniye, min dişewitînî. Tu hez dikî avê jê re bînî îkram bikî, ew dibêje te av anî niyeta te, kuştina min e. Yanê ji wan re şert nîn e ku ew tiştên ku te pê îtham dikin, tê de hebin, ew çer dibêje, dibêje were ye."

Weşanxaneyê Avesta jî daxuyand ku, ev berhevkerin ne hiqûqî ye û neh nivîsên ku bûne sebebên berhevkerinê, berê di rojnameyên cihê cihê de hatine weşandin û der heqê yekê de jî doz nehatiye vekirin.


Melik Fırat careke din aştîya gelan parast û got, "Dikarin me bigirin, dikarin me bidin mehkemeyê jî, me bikin hepsê jî, dikarin me îdam jî bikin. Em ji giştikan re jî hazir in. İcar gotina ku em dibêjin, gelên li vî welatî, rengê wan, dîne wan, zimanê wan çi dibe bila bibe, bi hevdu re bi aştî, bi biratî û bi xweşî dikarin bijîn û jiyyîne jî."

Weşanxaneyê Avesta jî li ser vê sîncariyê gote ku, "Fıkr û raman tu car nabe sîc. Dîvê mirov li hemberî vê helwestê bisekine."

AYNUR BOZKURT

ÇAVDÊRÎ

AMED TÎGRÎS



Li Stockholmê Enstîtuya Kurdî hat damezirandin

Li dem û dezgehên me yê çandî û zanistî yeke din jî zêde bû, Enstîtuya Kurdî li Stockholmê. Belê di roja 14'ê rezbera 1996'an de li paytexta Swêdê, li Stockholmê Enstîtuya Kurdî vebû. Wekî ku tê zanîn berê li Parîs, Stenbol, Bruksel û Berlînê Enstîtuyên Kurdî hatibûn damezirandin û niha jî li Stockholmê Enstîtuya Kurdî hat damezirandin. Bi vekirina Enstîtuya Kurdî li Stockholmê re hejmara Enstîtuyên Kurdî gihîştin pêncan. Zêdebûna hejmara Enstîtuyên Kurdî helbet dilê her rewşenbîrekî/e kurd xweş dike, lê pîrsa girîng ne zêdebûna hejmara Enstîtuyên Kurdî ye, pîrs û doza girîng encama xebat û berheman e.

Pîrsa herî girîng yekê jî di nav van Enstîtuyên Kurdî de xurtkirina tîkiliyên hevkarî, beş û parvekirina karê çandî û zanistî ye. Dîtin û baweriyên rêveberên Enstîtuyan çi dibin bila bibin, pêwîst e ku li gorî destûrên xwe di qad û çarçoveya neteweyî û demokratîk de bi hevdu re tîkiliyên xwe xurt bikin û bixebitin. Di nav xwe de kar beş bikin, her yek di warekî de xwe li ser xebata çandî û hunerî hûr û kûr bike. Di vî warî de, ji niha ve di navbera enstîtuya me û ya Berlînê de hevkarî û tevkeriyê baş heye. Em hewl didin û hêvî dikin ku di rojên pêş de bi enstîtuyên din re jî wekî ya Berlînê em hevkarî û hevkeriyên xwe xurt bikin. Di vî warî de birayê biçûk em in, divê birayên me yê mezin ji me re alîkariyê bikin, em ji tecrûbeyên wan kelk bigirin. Lê, ne ji tecrûbeyên wan ên xerab an jî nebaş, ji yê baş û rind helbet! Em ji niha ve soz didin ku bira an jî xwişkeke me ya nû çêbibe, em dê li gorî îmkanên xwe ji her aliyê ve alîkariya wê/ wî bikin.

Ne bi awayekî formel, divê bi rastî kar û xebatên çandî û hunerî bidin pêş xwe û li ser wan projeyan hûr û kûr bibin. Enstîtuyên Kurdî pêwîst e ku xebata siyasî jî partî û rêxistinên siyasî re bihelîn, rola partî û rêxistinên siyasî nedin ser milê xwe. Bi vê hewesê nekevin rê û kar nekin. Ew di warê xwe de xebatên ziman, wêje û kulturî û zanistî bikin û bi van xebatên xwe xizmeta pêşvebirin û xurtkirina partî û rêxistinên siyasî bikin, ne ku xwe bikine şûna wan an jî bi wan re pêşbirik û reqabetê bikin. Bi vê yekê re hinek partî û rêxistinên siyasî jî hene ku ne wekî partî û rêxistinên siyasî kar dikin, dev û dest ji karê siyasî berdane û ew wekî enstîtu û dezgehên çandî kar dikin û bi ser de jî xwe wekî partî û rêxistinên siyasî dihesibînin. Komikên wiha biçûk in ku bi rastî hejmara wan bi qasî malbateke mezin jî nemaye. Heger tam formalîteyan bi cih bînin hemû bîna ba hevdu hejmara wan ji komîteyêke komeleyekê re jî têr nake. Wiha wekî wan jî nabe. Ew jî êdî divê rewşa xwe zelal bikin, partî ne, rêxistinên siyasî ne an jî dem û dezgehên çandî ne, çi ne?

Em wekî Enstîtuya Kurdî li Stockholmê, ji niha ve dibêjin ku ji bo hevkeriyê amade ne ku bi hemû enstîtu û dem û dezgehên çandî û hunerî re kar bikin. Bi hevdu re plan û projeyên xebatê çêbikin. Her wiha deriyê enstîtuya me ji hemû nivîskar, helbestvan, hunermend û teknîsyenên kurd ên nîştîmanperwer re vekirî ye. Em dê destûra xwe di Kovara Avaşin hejmara 3'an de belav bikin. Ew rewşenbîrên destûrê bixwînin û bipejirînin û rewşa wan li gorî destûrê be dikarin ji bo endametiye serî li komîteya rêveber a enstîtuyê bidin. Yê ku nivîs, helbest, wêne û berhemên wan ên din hene, dikarin wan jî ji Kovara Avaşin re bi rê bikin.

Enstîtuya Kurdî di xizmeta gelê kurd de ye.

Gelê kurd li hemberf dagirkeran xebateke zanistî dide meşandin. Ji ber van yekan jî, xurtbûna siyaseta û diplomasiya kurdan li derve û li hundir her du lingên dijminên kurdan dixwe nava solekê. Li Tirkiye, Kurdistan û Ewropayê bi sedan sazî, rêxistin û komele mîna berhemên şoreşê têne binavkirin. Malbatên girtiyan jî li gelek bajar û metropolan, xwe birêxistin dikin. Meha çûyî li Edeneyê, ji bo ku bibe alîkar û piştgirê malbatên girtiyan komeleyek bi navê TADER (Komeleya Malbatên Girtiyan) ava bû.

Hevalê me

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

bi Serokê TADER'ê

Şehmus Çelebi re

hevpeyvînek pêk anî.



Serokê TADER'ê Şehmus Çelebi:

Em aştîyeke birûmet dixwazin

Birêz Çelebi, piştî hewldanên 6 mehan ev meheke ku komeleya TADER'ê bi awayekî fermî hatîye damezirandin. Gelo di vê pêvajoyê de, ji aliyê vekirinê ve tu asteng (çi siyasî û çi jî aborî) derketin pêşîya we?

● Na! Ji aliyê siyasî ve asteng derneketin. Lê bi awayekî ecêbmayî li vê hewldana me mêze dikirin. Çawa ku hinek kes rabin û ji bo piştgiri û alîkariya girtî û malbatên wan, saziyekê ava bikin. Her çi qas ji bo destûra fermî em bi derengiyê xistin jî, ji aliyê fizîkî ve nebûn asteng ji bo me... ango burokrasiya wan ji me re bû asteng.

Bi vekirina TADER'ê plan, proje û armancên we çi ne?

● Armanca me; yekîti, alîkarî û piştgiriya gelê me ye. Îro li Edeneyê û derdora wê bi hezaran girtiyên me hene. Malbatên wan xizan, belengaz û perîşan in. Gelek problemên wan hene. Heqê av û elektrîka xwe nikarin bidin, nexweş dikevin lê nikarin biçin nex-

weşxaneyan. Li aliyê din, li girtîgehan jî gelek pirsgirêk hene. Armanca me ya herî mezin ev e ku, em di nav malbat û girtiyan de bibin pirek. Ji bo vê jî çî bar bikeve ser milê me emê hilgirin. Emê xwe bi rêxistin bikin. Malbateke girtiyan li ku derê hebe divê em xwe bigihînin. Mesela em bibêjin deh kes ji malbatên girtiyan ji cihên, cihêreng radibin

N

ku biçin Girtîgeha Konyayê. Tev li erebeya Konyayê siwar dibin, lê hev nas nakin bi hev re dikevin nav bajarê Konyayê kes peya nabe, heta diçin ber girtîgehê giş peya dibin. Ji hev re wiha dibêjin: "Wey hûn jî hatin" ên din jî dibê-

jin "Haylo ma qey hûn jî hatin vê derê?" Ji ber vê yekê divê em beriya her tiştî hev nas bikin û werin cem hev.

Piraniya girtîgehên ku hûn li ser wan disekin in? Pirsgirêkên girtiyan û malbatên wan bi çi awayî ne?

● Piraniya girtîgehên ku em li ser

iha li Edeneyê û derdora wê bi hezaran girtiyên me hene. Malbatên wan xizan, belengaz û perîşan in, nexweş dikevin, nikarin herin nexweşxaneyan, nikarin heqê av û elektrîka xwe bidin. Li aliyê din, li girtîgehan jî gelek pirsgirêk hene. Armanca me ya herî mezin ev e ku, em di nav malbat û girtiyan de bibin pirek.

wan disekin in; Ceyhan, Sêwaz, Konya û Meletî. Em her dem bi malbatan re diçin serlêdan û dîtina girtiyan û her wiha dema darizandinê jî em diçin dadgehan. Wekî me berê jî got, pirsgirêkên girtî û yên malbatên wan zehf in.

Mesela girtî li gorî peymanên însanî û navneteweyî nayên darizandin. Mafên ku bi rojîya mirîne bidest xistine, ji aliyê rêveberiyê ve têne bînpêkirin. Dema girtiyan dibin mehkemeyan di erebeyên rîngê de li wan dixin, wan bi hev ve kelepeçê dikin. Leşker dikevin koxûşan û wan serobino dikin, dema girtî li ber xwe didin jî wê gavê dest bi weşsetê dikin. Mesela heftiyên borî, ji ber ku leşker di sa ketine koxûşan, derneketin dadgehan.

Dijwarî û astengiyên malbatan jî gelek in. Malbat dema ji girtiyên xwe re xwarinên bîngêhî dibin, çî fêkî û çî ji qût, ji aliyê leşker û rêveberiyê ve têne perçiqandin, qetkîrin û tevlihevîkirin. Ji zêbeşan bigire heta bacan û pîvazan gişan qet dikin, bi hinceta ku di nav wan de tiştên li dijî rêveberiyê û qedexê hene. Gelek xwarinan jî carinan nastînin, ji ber ku ew tişt li kantînên girtîgehan hene lê gelekî buha ne. Gelek caran ji zarokan bigirin heta pîrê 70 salî li ber girtîgehan dibin hedefa êrişên hêzên dewletê.

E

w kesên ku bi ber leşkerên xwe yên êsîr (dîl) nekevin û li dijî hewldanên xelaskirina leşkeran çi ji destê wan tê dikin, wê bi çi awayî bi ber girtiyên bikevin?! Îro Demirel, Erbakan û Çiller bixwazin jî nikarin çareserîya vê pirsê bikin. Ji ber ku ew li ber çavên MGK'ê ne tiştê in. Quweta wan ji vî karî re gelek kêr e.

Ji malbatên çepên tirkan ji bo endamîyê kêr an zêde serilêdan çêdibin?

● Di vekirinê de gelek ji wan, ji bo serilêdanê hatin cem me. Kêfxweşîya xwe anîn ziman. Lê belê nebûn endam. Ev kêmasiyek e. Em nabêjin em komeleya malbatên welatparêzan bi tenê ne. Her wiha em dixwazin mîsyona xwe hîn bilind bikin.

Çi çepên tirk û çî çepên kurd hene em dixwazin malbatên wan werin cem me. Bi beşdarî û tevlihbûna wan emê hîn bêhtir bi hêz û xurt bibin. Ne tenê di girtîgehan de, her wiha divê li derve jî yekîti, piştgirî û biratiya gelan bikeve qada jiyane. Ji ber ku dema dagirker û faşîst tene ser me nabêjin ev tirk e, yan jî ev kurd e û ev ereb e. Kî ne li gorî mîjîyên wan tevger bike û anti-kemalist be, ew neyar e û divê bête perçiqandin. Em bang li welatparêz, demokrat û şoreşgeran dikin; werin em dest bidin hev. Îro gelên cur bi cur ne li pişt me bin, vekirina me jî beleheq e. Îro eger malbatên ku bi hezaran girtiyên wan hene ji %30 jî piştgirîya me bikin û bibin endamên me, emê bikaribin gelek tiştan bikin.

Van rojên ku carinan behsa "Efiya Giştî" tê kirin nixandinên we li ser vê yekê bi çi awayî ne?

● Em dixwazin ku îro li Tirkîye û Kurdistanê tiştêkî wiha çêbibe. Ma kî ji şerê û tevliheviyê hez dike? Lê mixabin ez nebawer im. Em aştiyê dixwazin, em dibêjin xwîn bi xwînê nayê şuştin, em dibêjin bila girtîgeh vala bibin, lê tu kes dengê me nabe xwe. Îro ne tenê gelê kurd, her wiha gelê tirk jî tengasiyên mezin dibîne. Enflasyon her roj zêde dibe, nikare îro nanekî bi rehetî bixwe, li aliyê din jî radibe ji Kayseriyê kurê xwe dişîne Gabar û Bagokê ji bo leşkeriyê.

De ka hûn bifikirin, leşkerêkî ji Kayseri, Yozgat û Manisayê wê li wan çiyayan çî bike? Yan wê bê kuştin, yan jî wê bi psîkolojiyê xerab bizivire malê. Îro leşker jî, gerîla jî û girtî jî zarokên me ne. Çawa ku em bi ber zarokên wan dikevin, Demirel jî Erbakan jî û Çiller jî bi ber wan nakevin. Ji ber ku zarokên wan, leşkeriyê nakin. Ku bikin jî, li hemberî qesr û qonaxên xwe, li ber keviya behrê, li nav keçikên bedew "leşkeriyê" dikin.....

Îro ew kesên ku bi ber leşkerên xwe yên êsîr (dîl) nekevin, û li dijî hewldanên xelaskirina leşkeran (Fethullah Erbaş) çi ji destê wan tê dikin, wê bi çi awayî bi ber girtiyên bikevin?! Îro Demirel, Erbakan û Çiller bixwazin jî ni-

karin çareserîya vê pirsê bikin. Ji ber ku ew li ber çavên MGK'ê ne tiştê in. Quweta wan ji vî karî re gelek kêr e. Bi kurtahî ezê vê bibêjim: Ew tu car mafên me bi dilgermî nadin me, lê wê maf ji wan werin standin.

Di dawiyê de mesajekî ku hûn bidin heye gelo?

● Belê, du mesajên min hene; yek ji bo malbatan, ya din jî ji bo Erbakan

Em ji bo malbatan dibêjin, werin em dinyayeke din binin holê. Bila kenê dewletê bi me neyê. Barê me giran e, divê ew xwedî li saziyên neteweyî derkevin. Ji ber ku îro dewlet ne bi tenê bi tank û topan tê ser me.

Ez li vê derê bi riya Azadiya Welat dixwazim bangekê li Necmettin Erbakanê ku min 20 salan jê re xebat kiriye, bikim. Bila were em nîqaşa misilmaniyê bikin, lê misilmaniya rast û dirust. Wê gavê kî misilman û îslame û kî şertê îslamê bi cih tîne, wê diyar bibe. Dîsa kî xwîna birayê xwe dirijîne wê ew jî eşkere bibe. Li gorî min Erbakan ji Tûrkes xerabtir û zalimtir e. Ji ber ku Tûrkes zelal dibêje: "Ez neyarê kurdan im", "Ezê xwîna kurdan vexwim", lê Erbakan hem dibêje: "Em misilman, birayên hev in" û hem jî dibêje: "Ezê terorê safî bikim".... teror kî ye bila baş bifikire.

Hem dibêje "Em birayê hev in" û hem jî ji bo ku birayên xwe bikuje, diçe



Bovun edmek yoktur kitabımızda

bi Saddamê hov û bi Îsraîla siyonîst re peymanan çêdike. Em aştiyê dixwazin.

Rojekê Hz. Muhammed (S.A.V) ji eshabeyên xwe re dibêje: "Ezê tiştêkî ji we re bibêjim ku ji limêj û rojiyê ferz-

tir û xêrtir e, ev jî sulh e. Kuştina mirovan û qetîl, ji xerakirina Mekkeyê xerabtir e." Em dibêjin aşî, lê aştiyêke birûmet ku di şertên mirovatiyê û îslamiyetê de jî heye...



'Divê hunermend riya şoreşê bişopîne!'



Hasan Akgül digel du tabloyên xwe tê dîtin.

Wênesaz Hasan Akgül

Akgül di sala 1968'an de li Bismila Amedê hatiye dinyayê. Bi hewlên xwe hînf xwendin û nivîsandinê dibe. Malbata wî di 1979'an de koçî Çukurovayê dibe. Li Edeneyê di çayxane û avakirina însaetan de dixebite. Di 12 saliya xwe de dil berdide hunerên bedew û ji tebeşîr heykel û li ser kaxizên çîmentoyê jî dest bi nîgarkirina wêneyan dike.

Hasan Akgül, bi wan jî namîne û xwe hînf lêdana tembûrê dike û di gelek dîlanan de derdikeve pêşberî gel. Yekemîn car pêşangeha xwe sala par li NÇM'ya Edeneyê vekir.

Eger di welatekî serbixwe de çêkirina wêneyekî ji min bixwazin, ezê li ser bingeha Zîndana Amedê ya xerakirî "Muzeya Mazlum Doğan" çêbikim, ala rengîn jî li berê biçikilînim..."

Hasan Akgül, serê pêşîn bi mebesta qezencê dest bi çêkirina wêneyan dike, li sala 1980'yî. Diyar dike ku haya wî ji şoreşê nebûye û her wiha perîşanî û bindestiya gelê wî jê re ew çend ne girîng bûye.

Akgül wiha didomîne:

"Wê çaxê, min wêneyên keçikên spehî û bedew, wêneyên dar û beran, wêneyên erebe û avahiyên xweşik, bi kurtahî min wêneyên ku li ber çavan xweş dihatin çêdikirin. Lê dema min ew wêne çêdikirin jî, min ferq dikir ku, guherîneke gemarî di mejiyên min û di bedena min de çêbûye. Dilê min jî ne rehet bû. Çawa ku di mêjiyên min de kunêrek hebe û ez dikim û nakim nikarim vê êşê bidim birîn. Heta sala 1989'an min xwe di nava valahiyeke mezin de didît.

Di sala 1989'an û bi şûn de min dermanê vê êşê peyda kir û min ev êş ji nav mêjiyê xwe avêt. Min wê çaxê dît ku çanda min, rastiya min, dîrok û şoreşa min ne ev e. Min tobe kir û sondeke mezin xwar ku ji îro û pê de ezê firçe, xêz û rengên xwe ji bo gelê xwe yê bindest bi kar binim.

Di jiyana min de guherîna herî mezin ev bû. Ji wê rojê ve, ez birînen nav dilên gelê xwe di tûalên xwe de êşkere dikim.

Di sala 1989'an de min xwe nas kir, ji ber vê yekê jî, îro ez xwe 7 salî dibînim. Mîna zarokê paqij û bêguneh..."

Der barê pirsê me ya "Huner ji bo civakê yan huner ji bo hunere" de ku tim derdikeve ber hunermendan, ev bersiv da me:

"Ez naxwazim der barê vê yekê de veqetandin û cihêbûnekê çêbikim. Ji ber ku her du peyv jî hev temam dikin. Lê di şertên îro de, li welatekî mîna Kurdistanê jî bo moral û hêzbûna gel divê gelek wesîte amade bin. Ev yek wê bi xwe re piştgirî û alikariyê jî bîne. Ji ber van sedeman jî, divê "huner ji bo mirov be" bi firehî jî divê ji bo gel be.

Tiştêkî girîng jî ev e ku, divê mirov, welatên azad û serbixwe, ji welatên bindest û biserneketî cihê bifîkire. Di welatekî azad û serbixwe de pirsgirêkên neteweyî, azadî û serxwebûnê tune ne. Ji ber vê yekê huner ji bo wan gelan dibe mîna listok, kêf û seyrane. Lê li welatê me ev yek ne bi vî awayî ye."

Di tabloyên wî de em carinan axî û keser, carinan jî serkêşiya serhildanan, bi awayekî xurt û zelal dibînin. Me sedema van yekan jî jê pirs kir. Wiha bersiv da me.

Dagirkeran bi tenê berê xwe nedane vî welatî, wan berê xwe daye çiya, ne-

wal, deşt, şînahî û rez û pez jî. Naxwazim li welatê me gul û kulîlk şîn bibin. Di 5 salên dawî de ji 10'an zêdetir bajar û ji 3 hezarî jî zêdetir gundan nesibê xwe ji agir û şewatê standine. Dagirker îro çekên xwe yê kimyewî li ser me diceribînin. Helbet emê di welatekî wiha de portreyên bi vî rengî çêbikin.

Li dijî zilma zaliman, mazlûman jî serê xwe hildane, ji ber vê yekê jî, divê portreyên "serhildanan" pêk werin.

Heger welatê me ne Kurdistan, Fransa an jî Almanya bûya, meyê jî rabûya Kuleya Eyfelê û Katedrala Kölnê çêbikira. Lê îro pêwîst e ku em Kela Diyarbekirê, "Qirkirina Helepçeyê, Zarokên Sêwî, Dayikên Girtiyên, Gundên Şewitî û Şervanên li Serê Çiyayan" di tablo û portreyên xwe de bidin jiyandin."

Hunermend bi van daxuyanîyên xwe wezîfeya ku dikeve ser wan jî êşkere dikir û ji bo vê yekê jî wêneyên ku ji makîneya Ramazan Öztürk derketine nimûne didan û digot "Di wehşeta qirkirina Helepçeyê de wêneyê rojnamevan Ramazan Öztürk bi navê "Sessiz Tanık" (Şahidê Bêdeng) bandora ku li dinyayê kir, tu kes nikare bike."

Me pirs, "Ji te, di welatekî azad û serbixwe de çêkirina wêneyekî bixwazin, gelo tuyê xêz û firçeya xwe çawa bi kar binî?" jê kir, bersiva wî ev bû:

"Birastî jî, li dijî pirseke wiha mirov xwe winda dike. Pirseke zehf girîng e, li aliyê din jî zehf dijwar e.

Ji ber ku gelê Kurdistanê, êş û tarîfî,

xizanî û bindestî, talan û qetlîmamen gelek mezin dîtine û hê jî dibîne. Lewma jî ez bawer nakim ku piştî welatekî azad û serbixwe bi 200 salan jî, xêzên wênesaziya kurd biguhere.

Ez dixwazim mînakekê bidim; Berî 500-600 salî Yavuz Sultan Selîm di şerên Mercidabiq û Ridaniyeyê de bi 10 hezaran xwîna kurdan rijandiye, hê jî nehatiye jibîrkirin û wê piştî 500 salên din jî ev yek ji bîr nebe.

Her çiqas di welatekî azad û serbixwe de hinek tişt werin guherandin jî, bingeha hunera Kurdistanê divê ji rastiya wê ne dûr be.

Di sala jî di welatekî serbixwe de çêkirina wêneyekî ji min bixwazin, ezê li ser bingeha Zîndana Amedê ya xerakirî "Muzeya Mazlum Doğan" çêbikim, ala rengîn jî li berê biçikilînim..."

Ji bo demên pêşiyê jî hin projeyên wî hene û wiha dide xuyakirin:

"Ez dixwazim hêz bidim pêşangehan. Min di şala 1995'an de, di meha berfanbarê de li NÇM'ya Edeneyê pêşangeha xwe ya yekemîn vekir. Pêşangeh ji 19 wêneyan pêk dihat. Armanca min ev e ku di sala di bin baskên NÇM'ê de, di demên pêş de pêşangeha xwe ya duyemîn vekim. Her wiha emê vê carê cografyaya pêşangehên xwe berfirehtir bikin. Emê pêşangeha xwe, lê cihên ku şaxên NÇM'ê li hene, saz bikin, wekî Stenbol, Amed, İzmir, Edene, Mersîn û Hewlêr..."

S. TAŞKESEN



Li navendên çandê çalakîyên vê hefteyê.

Li NÇM'ya Stenbolê

● **21.9.1996 Şemf:** Teatra Jlyana Nû: Apê....!, saet 16:00

Konsera Koma Gulên Mezrabetan, saet 17:00

Panel: Koca Çinar Musa Anter, saet 18:30, beşdarên panelê: F. Hüseyn Sağınç, Muhsin Kızılkaya, Mehmet Oğuz, Rağıp Duran, Necatî Şyahkan

● **22.9.1996 Yekşem:** Konsera Zuğuşî Berepe, saet 15:00

Konsera Grup Munzur, saet 17:30

Teatra Jlyana Nû 'Zarokên Apê Musa', saet 18:00

'Nehîrler şîlr Topluluğu' ya BEKSAV'ê, saet 18:30

Li NÇM'a İzmirê.

● **21.9.1996 Şemf:** Çalakîyên li ser bîranîna Musa Anter:

Konsera Koma Dengê Bahoz, Koma Kendal
Koma Agîrê Zerdeştî

● **22.9.1996 Yekşem:** Resîtal.

Gitar: Şahan Kalkan, Viyola: Atakan Sarı, saet 18:00

Fîlmê Yılmaz Güney 'Arkadaş', saet 19:30

● **26.9.1996 Pêncşem**

Dîlan, Koma Kendal, saet 18:00

Fîlmê Yılmaz Güney 'Endişe', saet 19:30

RÛDAN

Diyarbakir tim di bîra min de ye



Nivîskarê navdar ê ermen Migirdîç Margosyan roja 18'ê rezberê li Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) li ser Amedê ku ew bixwe li vî bajarî hatiye dinyayê beşdarî gotûbêjekê bû. Nêzikî pêncî kesî beşdarî vê gotûbêjê bûn. Migirdîç Margosyan bi axaftineke kurt dest bi gotûbêjê kir û pişt re bi pirs û bersivan domand. Margosyan di axaftina xwe de "Ez p şî Herba Cîhanê ya Yekemîn hatime dinayê. Di wê demê de gelek însanan ax û ava xwe berda-bûn, koç kiribûn. Ji ber sebebên ku nayêne zanîn, belkî tê zanîn, belkî hûn tev jî dizanin, mecbûr mabûn ku welatê xwe berdin, koç bikin, herin..." got û li gotina xwe zêde kir:

"Tim ji min dipirsin, dibêjin, piştî ev çend sal çawa tu dikarî Diyarbakirê bîni bîra xwe û binivîsîni? Ew teferrûat çawa di bîra te de mane? Bi rastî min bîranînên xwe yê Diyarbakir ne ji bo ku ez rojekê bibim nivîskar û binivîsînim di hişê xwe de hiştine. Jixwe ev ne qabil e. Dema ez rûniştim û min nivîsand, min dît ku her tiştî di serê min de maye. Mal bi mal, kolan bi kolan her tiştî di hişê min de maye... Piştî çil salan, par ez çûm Diyarbakirê, xwezî min Diyarbakir di wî halî de nedîtibûya. Diyarbeki-

ra min di nav çil salan de hilweşandine, perîşan kirine..."

Piştî axaftina wî, guhdaran dest bi pirsan kirin. Dema guhdarekî pirs "Çima hezkirin û bêfikirîna te ya ji bo Diyarbakirê xurt e, lê ya Êrîvanê ew çend ne xurt e?" kir, Margosyan wiha bersiva wî da: "Berî her tiştî tu nizanî ku bêfikirîna min ya ji bo Êrîvanê xurt e, an na. Em ê min deynin aliyekî, lê bêfikirîna bavê min pir xurt bû. Di wê demê de Sovyetê destûr da ku ermen karibin herin Ermenîstanê (Hayastan) û ji her derên dinyayê ermen diçûn Hayastanê. Bavê min jî dixwest here. Her kesî êzingên xwe yê zivistanê ji havînê de hûr dikirin, amade dikirin. Wê salê çiqas diya min ji bavê min re bigota "Zivistan nêzik bû, êzingan hûr bike" bavê min wiha bersiva wê dida:

-Dev jê berde, çawa be em diçin!

Ew sal bavê min di sermayê de, di berfê de êzing hûr kirin. Tim li benda çûnê ma, lê vêga ew li goristana Şişliyê radikeve. Nikaribû bi zimanê xwe perwerde bibe, ji bo ku ez bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibim, hêj ez zarok bûm, ez şandim Stenbolê."

**Piştî çil salan,
par ez çûm
Diyarbakirê, xwezî
min Diyarbakir di
wî halî de
nedîtibûya...
Diyarbakira min di
nav çil salan de
hilweşandine,
perîşan kirine...**

R. DILOVAN

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Pêseramayena Stockholmî

Roja 2-3-4 ê gelawêje 1996 de kesê ke zarava kîrmanckî/kirdkî ser ro xebetîne, Stockholm de amê pêser. Bêguman na game, gamêde dîrokî biye. Dîroka zarava kîrmanckî de rêya verêne 15 mordemê cayanê ciyan amê pêser. Na pêseramayene de karê rind û qencî amê kerdene. Kombiyene efektîf xebetîye û berhemê bi qedrî dayî. Protokolê na pêseramayene dokumentêde dîrokî yo. Kesê ke na derheq de gurîne, ganî nê nivîsî biwanê. Ez naca hevalanê ke na kombiyene amade kerde, hetkariye kerde, kedê xo derbaz biyo, rê bi zerre û can spas kena. Nê hevalî weş û war bê.

No heto pozîtîf yê pêseramayene bî. Bêguman heto negatîf jî bî. Sebebê naye jî, ma rêya verêne amê bîme têlewe, yewbînî rind nêşinasnêne û amedekariyêde bingehîne nêkerd bî. Se ke yew hevalî/albazî kombiyene de arde re zon, na kombiyene de hîrê meyîlî veciyayî: Kîrmanc, kird, zaza. Cinay re 3 meyîlî? Sebata ke nê 3 meyîlî estê û rêya verêne ênê têlewe, sebata ke yewbînî rind nêşinasnêne. Karê kombiyenanê niyanêna ganî nêzdî kerdene nê meyîlan bo. Hama wunciya jî ez vana, na pêseramayene, şiyena ma qer-arêde bi îsabet bî.

Ma na teber ra na pêseramayene se asêne, mordemanê teberî, yanê yê ke naca nêbî, na pêseramayene se diyêne?

Kesê ke zahmet kerdene û sebebê na kombiyene û namê beşdaran persêne, zaf biyêne memnun. Qedre de giran dene nê karî.

La belê kesê de zahmet nêkerdene bipersê, mesela çik a, zê verî, zê her timî ebi verhukma na kombiyene kerdene malê "Zazayan, Zazaciyân". Bêguman sebebê niya fikiriyene estê. Kesê ke "Zazatiye" kenê estê û ênê pêser. Hem qeyî rêya verêne nê mordemî ênê vîriya zanayanê ma? Qeyî na mesela de pozîtîf nêfikirîne, tim negatîf fikirîne?

Ez bawer kena, sebebê nayê girêdayê nê zanayan o, girêdayê ma, yan jî şarê ma niyo. Ganî nê zanayî êndî heşê xo biyarê sarê xo. Ya ebi xo nê karî bikerê, yan jî ebi ters, şik û verhukuman na mesela de niya medêre. Zerarê na diyena çewte, zerarê na bawariya şaşê ma pêro, şarê ma pêro onceno/anceno.

Ez hêvî kena, ke no nivîs beno nivîsê pêyniye, Heke nêbî jî, hetanî ke raştiye biveciyo ser, ezo tim na mesela ser ro binivîsnê, bawariya xo biyarê re zon.

Ez ke raştiye bivacêrî, verê na pêseramayene, kêf û hewesê mi nêmend bî, ke ez na zarave ser ro bixebetiyê. Ez fikiriyêne û mi vatêne, "Çinay rê? Seba kamî? Ebi çî armancî? Eke na zarave ser ro xebetiyene, zê vîtrîn de wa malêde bîn bibo, amê diyê? Sebeb çik o, ke mordem parçêde na diyen û bawariye bo?

Nê nê, na kombiyene ra dime kêf û hewesê mi bî zêde, bawariya mi biye zixm. Ez ebi enerjiyêde newe cêrane ra.

Feyde karê kollektîfî dolimêna bî eşkera. Tek tek mordem şikîno bixebetiyê, berhemane qenca bidêro. La belê wunciya jî nêveceno. Ganî, se ke kombiyene de qerar amê guretene jî, nê kombiyenî peryodîk bêre kerdene. Berhemê kollektîfî bêre dayene û nê berhemê kombiyenan jî bêre vilakerdene. Eke ma wazenîme biresîmê cayê, xêca naye rayêde bine çîna.

Rastî, xwestek û ehlaq...

Li vî welatî nûçe ne li gorî rastiyê, li gorî daxwazan têne amadekirin. Rastî çi ye, çi, li ku, çawa qewimî? Ev ne muhîm in. Muhîm ew e ku çi têne xwestin?

Di 8'ê rezberê de roja şemiyê di rojnameya Hürriyetê de nûçeyeke balkêş hate weşandin. Leşkeran ji çapemeniyê gazin dikirin. Paşayekî wan, gazinên leşkeran bi vî awayî dianî ziman:

"Em li televîzyonan temaşê dikin, di nûçeyan de 'Leşkerên me li bakurê Iraqê dest bi operasyonan kirine' dibêjin. Em bi ecêbmayî li hev dinêrin: Gelo leşkerên me bêyî ku em emir bidin, diçin li axa welatekî din operasyonan dikin?"

Di çapemeniyê de kes li ser vî nûçeyê nesekinî, guhên xwe, çavên xwe girtin. Jixwe ew ji guh û çavên xwe zêdetir, devên xwe vedikin. Çapemeniya komarê jî mîna demokrasiya komarê ye. Çawa ku heta hemû rê li ber diktatorî û zirteçoviyê neyên girtin, dor nayê pirdengiya demokrasiyê, di çapemeniyê de jî heta ku vir û derew hebin dor nayê rastiyê...

Li vî welatî nûçe ne li gorî rastiyê, li gorî daxwazan têne amadekirin. Rastî çi ye, çi, li ku, çawa qewimî? Ev ne muhîm in. Muhîm ew e ku çi têne xwestin? Zor

û pere çi bixwaze, rastî ew e, nûçe ew e... Carina di vî warî de wisa pêş ve diçin ku xwediyê daxwazan bixwe aciz dibin.

Sistemeke wisa hatiye danîn ku rojnamevan bixwazin jî nikarin rastiyê binivîsin. Lewre nûçe li navenda rojnameyan têne guherandin û nûçeyan nikare îfraz bike. Ku bike, xwe li ber derî dibîne. Hinek jî wan li ber xwe didin, lê piştî demekê destare sistemê wan dihere...

Kêm kes hene ku heta dawiyê li ber xwe didin. Ew xwe li her derî dibînin, lê dîsa jî piştî xwe nadin rastiyê, bi rastiyê ve girêdayî dimînin; xîreta pênûsa xwe diparêzin. Yek ji wan kesan jî Nivîskar-rojnamevan Ragıp Duran e. Ew hem rojnamevanî çi ye nûçe çi ye, prensîbên nûçeyê çi ne, baş dizane û hem jî ji wan kêm kesan e ku tevî hemû astengiyên xîreta pênûsa xwe diparêze. Bi kurtasî ew rojnamevanekî "heqîqî" ye...

Berî niha bi demekê bi navê "apoletli medya (çapemeniya bi apolet)" li ser rewşa çapemeniyê kitêbeke Ragıp Duran derket.

Kitêb jî nivîsên wî yên ku berî niha di rojname û kovaran de derketine û ji hinek nivîsên wî yên nû pêk hatiye. Her çiqas kitêb jî nivîsên wî yên ku di demên cuda de û di weşanên cuda de hatine weşandin pêk hatibe jî, rengêkî tevahî dide.

Di vî kitêba xwe de ew li ser guherîna çapemeniya Tirkîyeyê ku piştî 90'î dest pê kir, disekine. Di vî demê de guherîneke çawa çêbû? Em bersiva vî pirsê ji kitêba Ragıp Duran bistînin:

"... Li meydana Hilbijartinê, li ser bane otobusê di destê Süleyman Demirel de pênc mikrofon hebûn, wiha digot:

- Hûn van dibînin ne wisa? Di dest min de pênc mikrofon hene, ev dide nîşan ku pênc televîzyon hene, berê yek bû, vî gavê pênc... Ava demokrasi, ava pirdengî ev e!

...wê êvarê bêyî îstisna nûçeyên hemû televîzyonan bi vî hevokê dest pê kir û gewdeyê Demirel yê qerese hemû ekran îşgal dikirin. Pênc mikrofon hebûn lê her pênc jî di destê yekî de bûn. Û di her pênc ekranan de jî eynî mirovî xuya dikir. Ew mirov jî Serokwezîr bû. Yanê pirdengî nehatibû welat, tenê pîr-mikrofonî hatibû."

Li ser pîrsgirêka kurdan li navenda rojnameyan nûçe çawa têne guherîn? Ragıp Duran bi mînakên zindî û balkêş di nivîsa xwe ya bi sernavê "mehmetçik muhabir" de bersiva pîrsê eşkere dike.

Ragıp Duran piştî ku rewşa çapemeniya tirkîyan tîne ziman, ji çapemeniya dinyayê û bêhtir jî ji çapemeniya Fransayê mînakên dide û li ser ehlaqê meslekê rojnamevanîyê disekine.

Duran, di kitêba xwe de bi sernavê



"entellektuelê herî girîng yê ku dijî" zimanzan, pisporê çapemeniyê, filozof Noam Chomsky bi xwendevanan dide naskirin.

Ev kitêb jî bo xwendevanên ku tirkî dizanin...

RAHMÎ BATUR

Ragıp Duran / apoletli medya
Weşan: Patika / Rûpel: 100

Girîngiya zimanê kurdî

FIRAT CEWERÎ



Bi kêmanî ev bîst sal in ku ez ji şoreşger û têkoşerên kurdan zehmetiya zimanê kurdî dibihîzim. Ew hem gazinan ji zehmetiya zimanê kurdî dikin, hem jî gazinan ji nebûna xwendevan û nivîskarên kurdan dikin. Ji bo Kudistanê têdikoşin, ji bo rakirina qedexeya li ser ziman û edebiyata kurdî li ber xwe didin, tîne girtin, îşkenceyên nedîtî dibînin, bi salan di girtîgehan de radizên, lê belê ew bi xwe jî bo vejandina zimanê xwe, ji bo naskirina kultura xwe, ji bo jî mirinê rizgarkirina ziman û edebiyata xwe zêde serê xwe naêşînin. Çi bigire hemû weşanên me kurdan bi zimanê tirkî ne, di rûpelên kulturî û edebî yê weşanên kurdan de ji berdêla danasîna berhemên bi zimanê kurdî mirov gelek caran pêrgî danasîna berhemên bi zimanê tirkî tê; carinan jî mirov pêrgî danasîna hin berhemên tî ku nivîskarên wan an kemalistên tûj in, an jî gelekî dûrî pîrsgirêk û rastiya kurdan in. Gava mirov ji hin weşanên kurdan gazinan dike û dibêje çima hûn weşanên xwe bi kurdî demaxin, em dibêjin ku kes bi kurdî naxwîne, lewma ew mecbûr dimînin û weşanên xwe bi tirkî derdixin. Biborin, lê bi rastî ez vî mentalîteyê fêhm nakim. "Kurd bi kurdî naxwînin, lewma em weşanên xwe bi tirkî derdixin". Baş e, te çi daye kurdan? Te kengê bi sedan pirtûk, bi dehan kovar û rojname, bi dehan kanalên radyo û televîzyonan

pêşkêşî kurdan kiriye û kurd jê reviyane? Ez bawer nakim ku me di warê ziman, edebiyat û kulturê de zêde tiştêk dabe kurdan. Ger em di wextê de bi girîngiya ziman û edebiyata kurdî bihesiyana, me xwendevanên kurd pê bihesandana, ez bawer nakim ku wê îro rewş wiha bûya. Lê dîsan jî, guhertina vî rewşê di destên rewşenbîr û siyasetvanên kurdan de ye. Ger ew ji hemû kompleksan bi dûr bikevin, li rastiya xwe vegevin, rastiya xwe bibînin, wê bikaribin di nava demeke kurt de, hem bi dehan weşanên bi kurdî derxin, hem jî bi hezaran xwendevanên zimanê kurdî bigihînin.

Ji ber ku rewşa xwendin û nivîsandina kurdî hê jî gelekî dijîbe rewşa salên sihî, ezê gotina xwe bi gotineke Kamuran Bedir-Xan ve girê bidim. Kamuran Bedir-Xan, di pêşgotina 'Dersên Şerîetê' de, der heqê ziman û edebiyata kurdî de, gazinan ji zana û mezinên kurdan dike û wilo dibêje: "Heke îro Kurdistan wêran e, kurd perîşan in, ev du belayên mezin in, ji nezaniya xelkê me ye. Xwende di nav kurdan de kêm in û birê kurdan ê bêhtir bi hê zimanê xwe yê şîrî nikarin bixwînin û binivîsin. Ji ber ku millet nikare bixwîne û binivîse, kitêb, cerîde û kovarên kurdî demakevin ku derketin jî, nikarin bijî, dimirin. Milletêkî bêkitêb û cerîde, milletêkî bêziman û bêdeng e, sist e, qedrê wî nayê girtin, heqê wî nayê dayîn û millet dibe lehîstokê milletên din. Milletê ku di vî wextî de nexwîne û nenivîse, ne îşê xwe û ne îşê welatê xwe dikare bizane û wan bigerîne.

Belavkirina xwendin û nivîsandina bi kurdî, hikûmeta Kurdistanê hebûya bi destê wê dihat qedandin. Lê her wekî îro hikûmeta Kurdistanê nî e, belavkirina xwendin û nivîsandina bi kurdî wezîfeya mezinên Kurdistanê ye. Mezinên welatê me beg, şêx û axa ne. Beg, şêx û axa pîr ca an qala peya, eşîr, mirîd û mirovên xwe

dikin û ew dizanin ku peya, eşîr, mirîd û mirovên wan xurt û serbilindahiya wan in. Mezinên me xweş dizanin ku bê eşîr, bê mirîd û peya, ne beg beg e, ne şêx şêx e, û ne jî axa, axa ye.

Heye ku bêhtir serekên me, şêx, beg û axayên me heta niha ji bo qenciya peya û mirîdên xwe hin tiştên rind pêk anîne. Lê halê Kurdistanê şanî me dike ku xebata wan an bê rê, an bê rêz û tertûb, an kêm bû. Wisa nebûya diviyabû milletê me jî, wek milletên din serbest, xurt û serfiraz bûya. Mezinên me dizanin ku milletê me ne kêmtî tu milletan e û her car bi ya wan kiriye. Ji ber ku îşê millet di destê wan de bû ji halê millet ew berpirsiyar in. Ji wan yek bi yek tê pîrsîn:

- Gelo te ji bo pêşveçûna mirov û mirîdên xwe çi kiriye? Em dereng mane, lê destpêkirin nivê qedandinê ye. Berî her tiştî divê, serekên me, axa û şêxên me ro berî rojekê hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibin. Bi tîpên kurdî, yê ku dil dike, dikare di nav du mehan de hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibe. Ji wê paşê divê her serek ji pênc mirovan re darsa kurdî bide û ew pênc peya divê xweş hînî xwendin û nivîsandina kurdî bibin û ku hîn bûn her yekî ji wan divê ji xwe re pênc hevalên din peyda bike û ji wan re dersê bide. Bi vî awayî di salekê de, pênc şagirtên serekêkî ji bîst û pênc mirovan re û ew bîst û pênc peyan, ji sed û bîst û pênc hevalan re û ew sed û bîst û pênc mirov, ji şêş sed û bîst û pênc peyayan re dikarin dersê bidin. Bi vî awayî di nav du salan de kurd hemî dikarin hînî zimanê xwendin û nivîsandina bi kurdî bibin..."

Bi hêviya ku wê rewşenbîr, siyasetvan, şoreşger û dewlemendên kurdan ji şêx, axa û begên kurdan jirtir derkevin û rojekê berî rojekê dest biavêjin zimanê xwe...

Kaxizên alastî

Kaxiza yekemîn: Bêwest, bêveger, memik spartî singê, por vezilandî, heyv kişkişandî, lat pişaftî, periya bedbext doxîne li bihuştê ji bîr dike. Dergevan diqore: "Rûperiyê ev doxîna dapîrê ye." Bêhest, bêhis, bêlebt sê mindalên birîndar, sê keçikên avis di bin sîtava sê kejan (dareke dirêj) de, dizûrin. Li penahekê bêmîrê, ji piştasoyeke nestêle, serheng sîtîlên gunehan li xwe dibarîne, derd û ahînan dikayînine. Li nêzî, leşker wêneyê doxîne dimijin, vexwestinê dicûn; li ber ronahiya çirayê, paşvexwezan dimijin, dicûn.

Kaxiza duwemîn: Şev li dû şevê, roj vemirtî, dem rawestî, kakêş xwe li hev badidin. Lehî ji azariyê dinalin. Rewan ji kujtariyê direvin. Laş li ser laş, gewd li bin gewdî, sêwlekek ji pêsîrê bera-vêtî sînoran ji hev dixê. Kîşweran dipe-lişîne; li meyxanê jinê difiroşe, xwe di-koje. Keç pişt heriftî li ser nivînan di-pojîne, dermanê sed û yek pîrejînan hil-diqetîne.

Perdeya pîrfiraz, ji mêj ve hilweşan-diye. Her êvarê memikan dialêse, her sedsalî wan dişo. Geh wan dialêse, geh wan dişo. Di nivê şevê de pêsîrê dê di-nixumîne, ji axurî hiltîne. Qirçixan jê dadiweşîne. Ji bo ku berî berbangê memikan dawerivîne, biparzinîne.

Kaxiza sêyemîn: Çi rengê şemê ye? Çi bêhna biharê ye? Raman çi ye? Mezopotamya çi ye? Zerdest kî ye? Kê kî kuşt? Kî kî dikuje? Mesehefa reş kani? Pirs li dû pîrsê, ezman û dû ezmên, tî, birçî, tazî ne. Lê em kurd in, tenê em kurd in, em kurtî û kûtî ne. Ji lewre, berşîrê landikê (pitikê pêçekê) sê razan vedişêre. Xanî sê helbestan dixemilîne. Ji mêj ve, vajbawerî (baweriya pûç) mêjî dimije û tîr çengî disoje, û dorpêç li çarmedorî sorgul û çiçekan diçilmî-sîne. Wiha, berşîrê landikê vê rastiyê dinase, lê vedişêre. Gelanî, heyîn û mayîn çi ne û eyîn çi ye? Sê pîrsên girîng dibarin, ji zû ve dibarin, her dem ew dê bibarin. Lê tenê, lê bes tenê, berşîrê landikê bi wan dizane, bi wan dijî û bi wan digirî, lê wan vedişêre, her dem ew dê wan veşêre.



Kaxiza çaremîn: Tina rojê, çelqelqa avê, sînga gewr, kekekela laşê bedew î ciwan, helkehelka shekî firazwer (mubecel), sawirê mê -xweç aneke bêran li ser wan zixurkan tîrêjen rojê dimije. Ezmanekî leç, heyveke windayî, sureke bêhêz, sêwiyê koncalekê, ji kakêşeke din xwe diqurnisîne; bêxwestin, divê laşê cankuj û dilrîv daqurtîne.

Li ser sirtên demê, ji nav awirên şevên ku nayên, li ser kenarên gerdûnê, ji nav memikên nû ber girtî, ji nav pêsîrên firoştî, keldûmaneke bêdawî keziyên dilberê dihûne; ranê sawirê lê vedigerîne.

Kaxiza pêncemîn: Şikefteke serdemî, kadîneke bêxwedî, xêzine ji aso veqetiyayî, rûçikine ji kêlikê hilweşayî, straneke dîrokî dastanî (melheme), ji berî vê kadizê, li bin qurmê vê darê hêlîna min û te nivco hiştiye. Her wiha, kîvroşkê wêneyên biçûkine xwe yî kuştî li ser memikên cîhanê, li ser demên rondikên te, li ser pêlên deryaya dilê min ê şikestî, li ser ronahiya çavên te yê vemirtî ji bîr kirine. Û hew dinase kîjan dêwî li ser pireke nabadîd (nediyar), pêsmalka janê dirandiye, raxistiyê, dirandiye.

Kaxiza şeşemîn: Li qeraxa çala mirinê laş li dû laşî, laşine dirandî, laşine mîna êzingê sotî, diherikin. Felîtejin li meyxaneyê pêsîran dihejîne, her du tilmankan dadiweşîne. Mîrê bi hêz û navdar, telefon li dû telefonê, ser li dû serî, gola xwînê dimiçiqîne. Li qeraxa vê çala mirinê, dem diherife, cih vedizile, ji derava wan laşan, keldûmaneke stewr xwe dispêre gerika laşê te û ji hêza dawî bang dike, heyânî aniha ew bang dike, her wiha ewê bang bike, lê kes tune ye, wê kes tune be.

Kaxiza heftemîn: Li qeraxa çala mirinê dema ku serê min bigindire, xwîna min wan deşt û newalan dagire, ezê bi ebrûyên xwe navê te yî nazenîn, li ser ezmanekî, "ne ev ezman" binivîsim. Û ji şîrav û gulava derdê xwe ezê xatirê herî dawî ji te bixwazim.

HEYBET BAVÊ HELEBÇE

Dema leşkeran mala wan dişewitand, Meta Pûşê diberizî wan. Ariya xanî di rûçikê xwe dida, nifr dikirin: "Ûrisên zer" digot ji wan re. Jixwe navê dînbûnê li ser bû. Çi bikira digotin, "dîn e". Derpiyê xwe dişeqitand nizanîm çiyê xwe nişanî leşkeran dida. Mirov li dijî astengiyan bangî Yezdan dike, lê Meta Pûşê her dem bangî Ezraîl dikir; xwe diavêt bextê Ezraîl. Kesî sedema vê yekê nedizana.

Wa ye, li bajarê Stenbolê bûn; kurek, du bûk, çar serî zarok û tevî qurçima nod salî. Meta Pûşê hetika guhdaran dibir, tewşo mewşo dipeyivî: "Li derveyî koşkên hikûmetê zarokên bêxwedî hene, ji mirov re dibêjin me bibin

Meta Pûşê

mala me, kî bi wan bixape, dikeve dafa hikûmetê. Mirov dibin, berî kuştinê li ser maseyekê xwîna mirov dimijin û hwd." Wê nesîhet dikirin: "Ger xortên kurd ên ku bi dest û pê jîr dê hay ji xwe hebin." Bi êvaran hin caran kemîn dantanî li odeyan. Di tariyê de xwe vedişart, ji nişka ve diberizî mirov. Ji şeni-yên malê ka kê ji wê kutan nexwariye? Dema lembeyê vêdixin, dibêje: "Wî lawo, min got qey tu şeytanok î!"

Hin caran bêhna wê teng dibû, di

quncikekî de çok dida û dilorand: "Ey Ezraîlo ez ketime bextê te, tu ruhê min bistînî; qurbana te bim Ezraîlo, edaleta te ev e? Li min were rehme, min ji vî diyarî xelas bike. Ev zilm e, bila mala zilmê bişewite..." Hevalên wê tune bûn; jixwe ji Stenbolê tiştek fêm nekiribû; bêhna kanalizasyonê pozê mirov dişewitand; xizanî, bê edebî... Kurdên derdorê jî sosret bûn. Kesekî ku ji dil û can lê guhdarî bikira tune bû. Wekî ku mirov heft qat di erdê de here xwarê,

here dinyaya tarî; dem û cih tevlihev-bûn.

Sibeyekê ji bûkekêxwe re dibêje: "Mala Bişar Axa nişanî min bide" Ez dê herim hinekî li ber derî rûnim." Bûk pê re hêrs dibe, dibêje: "Dayê ev der ji gund dîr e, mala Bişar Axa li gund e." Lê kî bi Meta Pûşê dikare? Ew dixeyide û dihere, ta êvarê nayê malê, winda dibe. Herkes lê digere. Cîran li hev dicivin û lê digerin. Zarokek xeberê tîne, dibêje: "Miriyeke li hêla leşkeriyê dîtine." Diherin ba garnîzonê, dinihêrin ku ev Meta Pûşê ye, bi tîlên stîrî yê leşkerî ve zeliqiye û can daye. Beriya mirinê gelekî pelpitiye; ser û guhê wê di xwînê de sor bûne.

MENDO MOBAR

Şêx û ziyaret

Li gundekî Kurdistanê şêxek hebûye, ji gundên derdorê hemû kes têne cem şêx. Hin destê wî maçî dikin, hin lingên wî. Hinek kar û berxan tînin jê re, hinek jî ji jina wî re xelatan tînin. Mebest ew e ku şêx destê xwe di serên wan bide da ku ji gunehên xwe efû bibin.

Rojekê zilamekî gelekî xizan tê ba şêx û digirî:

—Ya şêxê min, ez pir xizan im û zarok hemû wê ji birçîna bimirin. Tu alîkariyekê bi min re bike, ez ji xwe re karekî bikim.” Şêx li zilêm guhdar kir û pey re daşeke (çaş) keran da wî yê xizan. Mêrik pir kêf dîke û daşê dibe mal. Wê xwedî bike, paşê pê kar bike. Sal di ser re derbas dibê, daşê dîke kare rahêje bar.

Rojekê zilamê me yê xizan barekî giran li kera xwe dîke û ji gund derdikeve. Ha vir û ha wir êdî ji gundê xwe dûrketî ye.

Çima kera wî dibin bar de nakeve. Hema ker li wir diche me. Mêrik he-

ma erdê dikole û kera xwe dîke gorê û serê xwe datîne ser tirba kerê û diponije.

Bîskê dimîne kerwanek di cem wî

re derbas dibê. Serokê bazirganan wî dibîne û dibêje:

—Lawo te çima serê xwe daniye ser vir?

Mêrik bersiv dide, serokê bazirganan:

—Wele ev der ûcaxê, divê bibê ziyaret. Ev yek ferîştayan (melek) ji min re gotin.

Serbazirgan alîkariyekê pê re dîke û mezelê kera wî dibê ziyaret. Êdî xelk tê ziyareta wî û destê wî maç dîke û xelat ji wî re tê.

Şêxê ku daş dabûyê dibihîze û ew jî tê ziyaretê. Belê şêx nizane ew zilamê ku daş dabûyê ye. Şêx û mirfêdên wî tînin ziyareta wî, Şêx dibîne ku şêxê wê ziyaretê ewê ku daş dabûyê ye. Şêx dibêje:

—Lawo te çawa kir ma ne min daş dabû te?”


Mêrik lê vedigerîne:

—Wele daşa min mir, min ji ew xist mezelê û paşê min mezelê wê kir ziyaret. Şêx dibêje:

—Lawo dengê xwe meke.

Min jî mezelê diya daşa te kiribû ziyaret û ez bi wî şiklî bûbûm şêx.

FEREC KURÊŞIVAN



BIXELAT...

XAÇEPIRSA BIXELAT (34)

XAÇEPIRSA

Ç	B	Ç	Û	K	D	Ş	
X	A	V	B	R	A	J	Î
R	Z	A	N	Î	N	K	O
H	D	I	K	H	E	L	A
M	M	U	T	A	R	E	K
R	E	H	A	A	N	Ş	Î
H	I	N	A	V	R		
N	A	N	B	A	N		
B	E	R	E	V	A	N	



Bersiva Xaçepirsa 32'an

Xaçepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 34'an pirtûka

Rojen Barnas
"MILKÊ EVÎNÊ" ye.


Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nixandî, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsîn û tevî adresa xwe ji me re bişînin.





Kesên ku xelata xaçepirsa 32'an, pirtûka Helîm Yûsiv "MIRÎ RANAZIN" qezenc kirine: Orhan Çabuk/Enqere, Abdurahman Akbulut/Izmir, Hezniyê Qaso/Batman, Mazlum Doğan/İskenderin, Zerdeşt Cengiz/Amasya, Mustafa Selçuk/Mersin, Nejat Çelik/Tarsus, Mizgin Kapazan/Stenbol, Gazi Keleş/Bartın, Ebdulvahap Nas/ Tarsus

Rewindayî	Ask, ahû	Tîstonek	Oksijen	Sewaleke çiyayî	Tecrit
Selîm (wêne)	Rêl û rêçik	Tûxle	4	Xewagîran	Ne bîroj
	2			Dixîne stûyên ga	
Gramer					Cinavkek
Mam					Bersiva neyînî
	Bêhnvedan	3			
	Kamp				
Parêzkar					Neon
Organ					
	5	Conega	Pêxemberek	Sala çuyî	6
				Edeb	
Bajarek li başûr				Listokek	
Gîhanekek	Gengeş, munaqêşe			1	
	Notayek				
Ali, teref					
Rehet			Amûreki masîvanî		
			Germiyûm		



PEYVA VEŞARÎ





Şerî senî qedyenê

Na badoyin şero ki welatê ma di dom keno ey maneno. PKK aşti wazano, dewleta tirk şer wazena. PKK 1993 û 1995 di 2 finî adirbirna eşkere kerd û dewlet veng nêda ci. Qandê çiçya vend nêda ci? Ma cor di nûst kiştî ki aşti wazana adirbirna eşkere kena.

ri 2 rojan di qedînenê. Kamê nê HADEP'a, ÖDP'a, SİP'a, EP, DBP'a, KESK'a nînan girweyê xo rind biyardayê ca dê ci se, hem şer qediyayê hem jî PKK adirbirna nêqedî-nayê.

Nê pêtek niyamey wexto ki amey se jî bê jew di mitingî û panelî se kerd? Teva nê-kerd. Eger nê biyameyê pêtek mardimê ki nê şerî niya aqilyayê înan ra vatayê se: "No şer, şero qilêrin o, feydeyê nê kesî çinyo. No şerdo qilêrin di deshezaran esker, gerila û sivil merdê. Çar hezarî dewî veşyay û bi vengî, çar milyon kurdî welatê xo ra sirgûn biyê. Bêrê ma pêro piya nê şerî biqedînim. Nûwa tepya domanî seykur memanê, çenî viyay memanê, may zaf mebermê." Wina jî nêşaye se jî niye pero vanê, "Ma karkerim" wa jew roj kar viradeyê, 2 saetî şartelî bi-yardayê war. O waxt senî adir kewte dew-let. Eger wina bikardayê se êkê nê şerî niya aqilyayî, ê jî aqilyayê ci. O waxt no şero qilêrin qediyayî. Ma pêriknan dî, waxto ki adirbirna bi, dewlet her roj operasyon viraş-tê, waystê ki hemû kurdan biqedîno. PKK'ê waxto ki adirbirna eşkere kerdibi, o roj vat: "Eger dewlet ma ser meyro se, ma dê qe jû fişek meçekim. La bêro ma ser se, ma jî xo pawem."

Bewnê adirbirna qediyayîş di mebûse RP Fetullah Erbaşî se vat: "Eger jû kiştî tim fişek çekro se, operasyon ser operasyon vira-jo se, kiştî bînda adirbirna biqedîno." Raşt vat, nûwa tepiya, kamdo kamîn riya PKK ra vajo, adirbirna eşkera ki, PKK di finî eş-kerê kerd, kesî qedrê ci nêzana. O nika fina vano: "Mayê aşti wazem, dewleta tirk ope-rasyon virado, ma adirî viradem, qe jû fişek nêçekem."

Mayê tiya ra fina veyndem hemû sosya-listan, demokatan, roşnikaran û êkê xo ra vanê: "Ma mardimî mi" wa veng bidê nê vengê kurdan.

Bewnê adirbirna senî qediya, Sêwaz di du provokasyonî viraşti. İstasyon di tren ra êrîş kard, 8 mardimî kiştî, eyşt PKK ser. Badê du rojan fina Sêwaz di qurşînê nay jû ereba, hîrê mardimî kiştî, nê jî eyştî PKK ser. La belê PKK eşkera kerd: "Va nê mar-dimî ma nêkiştî, dewlet nê mardimî kiştî."

Nika, hemû mardimê ki aşti wazenê şirê Sêwaz nê provokasyonan veje tever. Milet bizano nê mardimî kam kiştê. Nînan wina kardiş di êkê nê şerî dom kenê, êdê ya ronîşê, ya jî êdê biqediyê.

MEMED DIREWŞ

Em dixwazin we di şahiya hevnasînê ya **Azadiya Welat** de li cem xwe bibînin. Werin em hev û din di şahiyêke kurdî de binasin, rojnameya xwe xurt bikin. Bi beşdariya we dê hêviya azadiyê geştir bibe.

Bernameya şevê

Ji Başûrê Biçûk hunermendê navdar **Seîd Yusif** beşdarî şeva me dibe. Her wiha di şevê de komên muzîkê, govendê û gelek stranbêjên navdar hene.

Cih: Karides Restaurant
Navnîşan: Kenedi Cad. Yenikapı No: 90
Dem: 4 Kewçer (Ekim) 04.10.1996
Saet: 19.30 dest pê dika

Yekemîn avahiya çanda azad: NÇM



Berî niha bi 5 salan, di avahiyeke kevnare ya tamîrkirî de saziyek hate avakirin. Belê di sala 1991'ê de dûvajoyên şaristaniyeke qedîm ku hin dixwazin hebûna wê înkâr bikin, zarokên êgir Navenda Çandê ya Mezopotamyayê vekirin. Gelê kurd ê ku welatê wî, zimanê wî hatiye qedexekirin û çand wî talan bûye, bi saya şerê Tevergera Azadiyê ku vejîn pêk anî, êdî li nîrx û hêjahiyên xwe xwedî derdiket. NÇM'ê peywi-reke ku ji aliyê manewî ve di asteke gelekî bilind de bû, hilgirt ser milên xwe.

Ez wê çaxê li wir bûm, jinên kurdistanî, kal û pîr, zarok, heta mirovên ku di tevahiya jiyana xwe de kurdbûna xwe înkâr kiribûn, bi cêj û ekla azadiyê dihesiyan. Hin kes ji kêfan digirin, rondikên dilşadiyê dibarandin. Dayikên şehîdan serbilind dibûn, lewre didîtin ku xwîna keç û kurên wan beredayî nerijiyê ser xaka welêt. Tilîlî di wê avahiya kevnare ya tamîrkirî de hilnedihat, heta li Stenbolê jî hilnedihat, dixwestin xwe bigihînin çiyayên asê,

yên serhildayî. Wê rojê çanda agir û heta-wê ku hinekan digot, "Nîn e, bêbinyad e", ji ayendeyê re digot: Merheba!

Navenda Çandê ya Mezopotamyayê bi îmkânên gelekî kêr û bi kadroyên amator diket bin barekî gelekî giran û payebilind. Vê saziyê wê çand û hunera kurdî derxista holê, berhev bikira û pêşkêşî gelê kurd bikira; digel vî karî diviyabû li dijî dijminê hov ji li ber xwe bida. Ji ber ku komara tirk hebûna kurdan bi defdana tevgera azadiyê pejirandibû, lê bi tenê di axaftinê de, di pratîkê de navenda çanda kurdî wekî şirketeke ticarî dihesiband.

Heke mirov rastiye bibêje, bi wan derfetên hindik, mirov ancax karibû karê komeleyeke biçûk pêk bîne, lê em îro dibînin ku ew kardoyên hindik û ji îmkânan bêpar ji bin barên gelekî giran rabûne, gelek tişt bi dest xistine. Komara tirk bi awayekî hovane êrîş bir ser vê saziyê; xebatkarên wê hatin girtin, îşkence li wan hate kirin, çalakiyên wan hatin qedexekirin, lê dîsa jî KT'ê nekarî dengê wê bibire. Ji ber

Jinên kurdistanî, kal û pîr, zarok, heta mirovên ku di tevahiya jiyana xwe de kurdbûna xwe înkâr kiribûn, bi cêj û ekla azadiyê dihesiyan. Tilîliya dayikan di wê avahiya kevnare ya tamîrkirî hilnedihat, heta di Stenbolê jî hilnedihat, wê dixwest xwe bigihîne çiyayên asê, yê serhildayî.

ku NÇM bûye zimanê dîrokeke 5 hezar salî, tu hêz nikare dengê wê bibire. Ew bûye daxwaza 40 milyon kesî, hêza komara tirk têrê nake ku wê bigire.

NÇM'ê şax dan; di serî de li Amed, Îzmîr, Edene û Hewlêrê, paşê jî li Mersîn û Ruhayê şaxên NÇM'ê hebûn. Di destpêkê de Koma Çiya, Koma Mezrabotan, Koma Azad û koroya zarokan; Gulên Mezrabotan ku bi dilê biçûkan di her şev û şahiyê de ços û bi boşahiya welêt digihand mirovan hebûn; her wiha Koma Serhildan a ku bi rengên neteweyî û bi şeweyê resen dîlan û govendên gelêrî pêşkêşî gel dikirin. Di nav wan şert û mercên pir

NÇM'ê heta îro gelek berhem dane, hem jî berhemên hêja; yekemîn şanoya nûjen û zanistî Jiyana Nû di bin banê vê saziyê de hate avakirin. Vê koma şanoyê heta niha bi dehan şano pêşkêşî gelê kurd kirine. NÇM'ê heta niha 12 kasetên muzîkê derxistine, helbest û awazên di wan kasetan de gelek rengên nû û nûjen li muzîka kurdî zêde kirine. Niha hejmara komekên muzîkê hê jî zêde bûye, ev kom hemû jî ji kesên zana pêk tên û kesên di nav wan koman de wê bibin hunermendên têrgihîştî yê rojên li pêş. Kaseta Koma Agirê Jiyane ku van rojên dawîn derket, nîşana vê yekê ye. Niha NÇM li asteke ku



giran de pêkanîna çalakiyên bi wî rengî çavên dijmin ditirsandin. Bi tundbûna êrîşên dewletê re, NÇM zêdetir xurt dibû, kesên ku ji ber meroqê dihatin serdana saziyê, an jî di demên xwe yê vala de dihatin, heta kesên ku li dijî têkoşinê bûn jî, dema ev bêtahamûliya komara tirk didîtin, hêrs dibûn, êdî li çanda xwe xwedî derdiketin.

NÇM'ê digel ewqas zilm û kotekiyan û di nav şertên giran de gelek tişt pêk anî, gelo çiyê saziyên me yê di nav mercên rihet de ku nagihîjin siya NÇM'ê kêr bû? NÇM'ê dido jî şehîd dan dîlana azadiyê, Ali Tanîş û hevalê Melek. Ew her du jî hunermend bûn û tekane daxwaza wan xwedî li çanda dewlemend a Mezopotamyayê derketin bû, lê dîsa jî dema komara tirk bédengî li wan kire ferz, wan li ser lûtkeyên çiyayê bi çekên xwe qerîna azadiyê berz kir.

di warê çand û hunerê de nîrx û hêjahiyên kurdî berz dike, cih digire.

NÇM'ê bi vekirina Enstîtuya Kurdî, maskeya dijmin daxist, rûyê rejîmê yê rastîn nîşanî cihanê da, lewre hê di dema vebûna Enstîtuyê de, dijmin bi awayekî hovane êrîş bir ser. NÇM ne tenê li Bakur, li parçeyên din ên Kurdistanê jî xebatê dike, şaxên wê li wan deran jî hene.

Divê hemû saziyên çanda kurdî NÇM'ê jî xwe re mînak bigirin. Dema ew karibe di nav lepên dijmin de, tevî ewqas zordariyê karên ciwantirîn bike, divê mirov baş li serê bifikire. Li gori baweriyên min her kesê ku dibêje: "Ez kurd im, hez ji çanda xwe dikim" divê li nik NÇM'ê cihê xwe bigire û çî madî, çî jî manewî divê piştvanîya wê bike. Ev saziyê yekemîn avahiya çandê ya Kurdistanê azad e.

ROTÎNDA YETKÎNER

